


Qanûna bingehîn a tirk kete bin çavdêriya normên navneteweyî

Di hiqûqê de kambaxtirîn rewş



Yaşar Kemal:

✓ "Em niha di bin zordariyeke mezin de ne. Yan em dê bi axivin bikevin girfîgehê, yan jî em naaxivin. Ez jî girfîgehê xwe nadim alî. Ez jî bo azadiyê têdikoşim. Kêşeya Kurd jî beşek jî têkoşîna min a demokratîk e. Lê rojekê ku fersendê bibînin, wê bi guhê me herduyan (Akin birdal) bigirin û bavêjin hundir. Ji ber ku qanûnên Tirkiyeyê destûra wê yekê didin. Hemû dinya Tirkiyeyê rexne dike lê ne xema wê ye. Deh salan jî me mahkum bikin, tiştê naguhere. Ez çiqas navdar bim jî Tirkiye dikare min mahkum bike. Lê têkoşîna min wê bidome.


(Nûçe:R.3)

Belediyeyên HADEP'ê dikarin roleke siyasî jî hilgirin


✓ Bi henekî be jî êdî behsa "Kurdistan Ewrûpayê" jî dibe. Lewre kurd bêhtirîn li vê derê darî çav dibin. Şerefxan Cizîrî yek ji van kesan e. Cizîrî, endamê Lijneya Navendî ya Partiya Çep a Swêdê ye. Partî, yek ji partiyên herî mezin ê Ewrûpayê ye. Cizîrî, li ser dîroka Partiya Çep, helwesta wê ya bo Kêşeya Kurd, danûstandina wê û HADEP'ê û helwesta Ewrûpayê ya li ser MHP'ê dîtinên xwe derbirin.

(Hevpeyvîn:R.8-9)

Şerefxan Cizîrî:



MEH Û ROJA ŞEHIDAN LI DAR E:
EW ŞEHÎDÊN
MIROVAHIYÊ NE



Dîroka Têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê, dîroka şehîdan e. Têkoşîna hemdemî, li ser xwîna şehîdan bilind bû, bi pêş ket û her çû mezin bû. Têkoşîn, îro jî li ser xwîna şehîdan ber bi serfiraziyê ve dimeşe. Partiya şehîdan PKK'ê, di komcivîna xwe ya çaremîn de, biryar stand û meha gulanê, wekî meha şehîdan ragihand.

(Rûpel:6)


ŞERÊ YÛGOSLAVYAYÊ
RENGEKÎ NÛ GIRT



Êrîşên hêzên hewayî yên NATO'yê, ku li ser Yûgoslavyayê pêk tîne, hefteya çûyî bi bombebaran li ser Balyozxaneyê Çînê ya li Belgradê ku roja 8'ê gulana 1999'an pêk hat, rengêkî nû girt. Di vê bûyerê de 3 rojnameger hatin kuştin û 20 kes jî birîndar bûn. Yek ji Rojnamegerên ku hatin kuştin, nûçegihanê Ajansa Xinhuyê bû ku ji bo Rojnameya Guangmingê dixebitîn û jin û mêrê hev bûn.

(Rûpel:11)

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMI TAN

Doza Öcalan dê pêşeroja Tirkîyeyê diyar bike

Hinek kes xurtbûna DSP û MHP'ê wekî xetere dibînin, hinek jî dibêjin, li hemû welatan kêşeyên bi vî rengî, ji hêla hikûmetên tund ve hatine çareser kirin.

Pîştî hilbijartinê, rojev bi mijarên cur bi cur hate dagirtin. Li aliyekî zêdebûna dengên MHP'ê, li aliyê din 'mêbûsa bi şarpe' û gelek tiştên din. Ji bo kurdan, bûyera girîng encama ku HADEP'ê di hilbijartinê herêmî de bi dest xistî ye. Kurd, cara yekemîn rêveberiya herêmî ya welatê xwe bi dest dixin. Ji ber vê yekê jî kêfxweş in, lê ew nizanin ka ev kêfxweşî dê heta kengî bidome, lewre belediyeyên ku bi dest xistine di nava deynan de xeniqîne û çavê her kesî li ser wan e. Bi taybetî hêzên xêrnexwaz, li pey hinek listikan in, ji bo ku desthilatiyê ji destê endamên HADEP'ê bigirin. Li aliyê din gelek arîşeyên bajarvaniyê li holê ne, gel li hêviya çareseriyê ye.

Niha li holê, derfeta pêkanîna projeyên mezin nîn e. Lê dîsa jî derfeta pêkanîna hinek projeyan heye. Bi dîtina me, divê belediyeyên HADEP'ê giraniyê bidin çalakiyên çandî, bi vî awayî dikarin atmosfereke demokratîk pêk bînin. Festîvalên navneteweyî yên

pirtûk, şano û sînemayê dê dilê gel xweş bikin. Her wiha kursên pişeyî, konferans, panel û semînerên çandî dikarin di warê perwerdekirina gel de bibin alîkar.

Divê bê gotin ku îmkana pêkanîna van tiştan hinekî jî girêdayî helwesta dewletê ye, lewre heke dewlet li ser riya xwe ya berê bimeşe, nahêle ku belediye gawekê jî bavêjin. Her wiha dema dewlet doza daleqandina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bike û wê demê dê gelê kurd jî reaksiyoneke tund nîşan bide û dê serhildan dest pê bikin. Di rewşeke wisa de, ne kes dikare çalakiyên çandî pêk bîne, ne jî gel guh dide wan çalakiyan.

Li vir girîngiya Doza Sedsalê derdikeve holê. Ev rastî, di daxuyaniyê Konseya Serokatîyê ya PKK'ê de jî hatiye zimên. Rêveberên PKK'ê diyar dikin ku, helwesteke erênî ya li hemberî Öcalan, dê rê li ber çareseriyê veke û ew jî dê ji bo pêşeroja gelan baş be. Li gorî agahiyên ku parêzerên Öcalan didin, ew jî dixwaze ku vê dozê

bike platforma çareseriyê Kêşeya Kurd. Tê gotin ku Öcalan her wekî mesajên xwe yên berê, dê dîsa doza yekîtiya gelan li ser hîmê wekhevî û biratiyê bike. Lê li hemberî vê yekê, helwesta Dewleta Tirk dê çî be, ne diyar e.

Hinek kes xurtbûna şovenîzmê û zêdebûna dengê partiyên mîna DSP û MHP'ê, wekî xetere dibînin û didin zanîn ku bi wan partiyên çareserî nabe. Dîtina serdest ev e. Hinek jî dibêjin, desthilatdariya van hêzan bêhtir li çareseriyê digunce, lewre li hemû welatan kêşeyên bi vî rengî, ji hêla hikûmetên tund ve hatine çareser kirin. PKK jî, xurtbûna wan partiyên wekî hewla dewleta tirk a ji bo afirandina hêzeke xwedî biryar dibîne. Rayedarên PKK'ê di wê baweriyê de ne ku, hêzeke wiha dikare ji bo çareseriyê jî tevbigerê, roleke neyinî jî pêk bîne. Ew dibêjin "Heke ev hêz erênî tevbigerê, riya xurtbûna Tirkîyeyê jî vedibe, lê heke roleke neyinî pêk bîne, dê şerekî dûvedirêj di navbera kurdan û tirkan de dest pê bike, ew jî dê ziyane bigihîne her du gelan."

Magna Carta Öcalan û Tirkîye

AZAD ALTUN

Mirovahiyê hîn di sala 1215'na de pêdivî bi demokrasîyê û parastina mafê azadiya kesên dîtiye. Di sala 1215'an de di navbera baron û kralê Îngîlistanê de, bi riya vê peymanê gawek ber bi demokratîkbûn û aştiyê ve tê avêtin.

Berîya ku peyman bê girêdan, di navbera qralê Îngîlistanê û baronan de şerên gelekî dijwar û kirinên hovane pêk dihatin. Dema ku Qral John tê ser text, mal û milkê baronan desteser dike. Her wiha qral, bêsûc û bê sebeb dikaribû baronekî beyî ku bidarizîne bikuje.

Edaleta hingî bi saya pergala wê demê bûbû wekî 'bazara petîxan.' Yanî kesê ku bikaribûya edalet bi pereyan bîstana, tiştêk bi serê wî de nedihat. Lê yên reben û belengaz diketin bin fermana şûrê komploya nav qesran.

Qral John di sala 1199'an de hatiye ser text û heta Peymana Magna Carta (Fermana Mezin) sala 1215'an li ser text maye.

Bêguman baron jî destvala namînin. Ew jî li hemberî kirinên kirêt yên

keyîtiyê (qralî) serî hildidin û di encama têkoşîna xwe de, wî mecbûr dihêlin ku Peymana Magna Carta îmze bike.

Bi vê gavê, di sala 1215'an de yekemîn car jî bo demokrasî û aştiyê mafê kesên bi saya peymanê dikeve bin ewletîya qanûnan. Xalên wê peymanê li gorî wê demê gelekî balkêş in. Wekî mînak; di xalekê de wiha tê gotin: "Kesekî/e azad, li derveyî qanûnan nayê girtin û mulkê wî/wê nayê desteser kirin. Kes divê ji mafê ku qanûn didin, bêpar nemîne." Di xalên din de jî li ser edaletê gelek tiştên balkêş hene. Wekî mînak; di xalekê din de jî wiha tê gotin: "Edalet nayê kirin. Divê edalet bi derengî nekeve. Tu kes divê ji edaletê bêpar nemîne."

Têkoşerên mafên mirovan û demokrasîyê hîn berî niha bi 787 salan, sedsala pêşîya xwe ditiye û li gorî wê, qanûnên xwe danîne.

Mirovahiyê xwe tenê bi wê peymanê sînor nekiriye. Di sala 1789'an de ala demokrasî û aştiyê, ewlekariya canê mirovan, dîsa bi danezana mafên mirovan a Şoreşa Fransayê ketiye bin ewlekariya qanûnên gerdûnî.


Li dûtîyê yekê, di sala 1948'an de dîsa bi Danezana Mafên Mirovan a

Neteweyên Yekbûyî ji nû ve hatiye saz kirin, berfireh kirin.

Bi van danezanên mafên her kesî hatine naskirin û bi nixrên gerdûnî hatine barkirin.

Welatên ku xwestine pergaleke demokratîk bi cih bikin, pêşîn di qanûnên xwe de guherîn pêk anîne û dûre jî xwe wekî "abîdeya demokrasîyê" nîşan daye.

Gelo welatên ku ji sedî yeka rêbazên gerdûnî yên mafên mirovan û ewlekariya canê mirovan neparastin, dikarin xwe wekî "abîdeya demokrasîyê" nîşan bidin? Ma welatê ku nikaribe ji sedî yekê xwestekên berî niha bi 787 salan di welatê xwe de bi cih bike, dikare çêlî hiqûq û demokrasîyê bike? Welatekî ku rêbaza hovane, neqanûnî û nehiqûqî bi kar bîne û wekî berî dema Peymana Magna Carta mirovan di encama komplo-yekê de bi riya muhafîzên nav qesran birevîne, dikare piştewaniya ewlekariya canê mirovan û mafê darizandîneke dadyane bike? Balkêş e Peymana Magna Carta di avabûna Amerîkayê de bîngeha avaniya siyasî pêk tîne. Gelo Tirkîye dê bîngeha avabûna xwe ya siyasî ji vir û pê de ji çî wê pêk bîne?



Filmê "İsa" bi kurdî jîyan û ramanên Hezretî İsa dide pêş. Ev berhem, dê kesê ku hûn bawer in hûn wî nas dikin ji nêz ve bi we bide nasîn.

NAVNÎŞANA XWESTINÊ
PK.8 Acıbadem 81020
ISTANBUL

AZADIYA WELAT
ROJNAMEYA HEFTIYÊ (Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212) 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerîndeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)

SAMI TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Ses Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım
■ NIVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)

■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ İzmir:
Tel: 0 (232) 446 19 50
■ Mersin:
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ Edene:
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nûnerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swisre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Almanya:
Fener Rojbiyanî
Tel: 49 228 92 51 284
■ Sweden:
Şoreş Reşî
Tel: 46 86 52 34 29
■ Fransa:
M. Ali Doğan

Tel- 33 614 32 43 55

■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewiz
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiy

KURTENÛÇE

RAPORA BINPÊKIRINA MAFÊN MIROVAN A MEHA AVRÊLÊ

Şaxa Stenbolê ya KMM'ê rapora Şavrêlê ya mafên mirovan ragihand. Li gorî raporê di meha avrêlê de 1415 kes hatine binçavkirin, 65 kes hatine girtin, girtiyekî jiyana xwe ji dest daye. Her wiha 31 kesî ji ber muameleya xedar û îşkenceyê serî li komeleyê daye. Digel van yekan 38 kes ji mafê jiyane, 182 karker jî ji mafê xebatê bêpar mane. Wekî din, 8 endamên çapemeniyê beramberî êrîşan mane, polîsan bi ser 14 nûnergehên rojnameyên de girtiye, 51 endamên çapemeniyê jî hatine binçavkirin. Di meha avrêlê de 9 TV û radyo ji aliyê RTÜK'ê ve hatine girtin. Biryara asêkirinê ya 6 rojname û kovaran hatiye dayin. 36 rojname û kovar hatine berhev kirin. Navendeke çandê hatiye girtin. 2 sal û 8 meh ceza hatiye dayin, bo derbirina ramanan 18 sal tê xwestin. Her wiha di meha evrêlê de 11 cih jî hatine bombekirin.

REZERVASYON HÊVIYA TIRKIYÊ TÊK DIBIN

Bi pey agahiyên berdestbûyî, Almanya û Awisturyayê, îsal rezervasyonên turîstan ên bo Tirkiyeyê gelekî kêmtir kirine. Meha gulanê li Awisturyayê, îptalkirina rezervasyonan derkete %80'yî. Şefê Continental nûnergehên turîzmê yê de verî Joseph Reitinge-Loska diyar kir ku, pêwîst bû wan bi awayekî acil mudaxele yê vî rûdanê bikira. Lewre jî wan dest avêtiye welatên Behra Spî yê din. Di vî navberê de nûneriya gerê KEG Caccia ku girêdayî şirketa turîzmê ya navdar Check-In a Awisturyayê ye, daxuyaniyeke balkêş ragihand û wiha got: "Tirkiye ji aliyê leşkeran ve tê birêvebirin. Mafê kurdan tene binpêkirin. Piştî ku Öcalan hate girtin li Tirkiyeyê rewş guherî, lê şirketên me serwest nakin."

DOZA GÖKTEPE JI BERÊ XWE DA DIMEYÊ

Parêzerê Metin Göktepe Kamil Tekinsüre, diyar kir ku, cezayê ku bo polîsan hatiye dayin, ne tatmînkare. Parêzer Tekinsüre dide zanîn ku, eger dadgeh daxwaza wan ya temyizê nepejirîne, ew dê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê bidin. Diya Metin Göktepe, Fadime Göktepe û xwişka wî Meryem Göktepe digel parêzer Kamil Tekinsüre 10'ê gulanê li KMM (İHD) daxuyaniyeke çapemeniyê ragihand. Biryara dadgehê, di daxuyaniyê de bi du awayan hate nirxandin; li gorî parêzer tawanbarkirina kujeran li welatekî wekî Tirkiyeyê gaveke erênî ye, lê aliyê neyinî, tawanbarnekirina kesên ku fermana kuştina Metin Göktepe daye ye.

NAVENDA NÛÇEYAN

Qanûna bingehîn a tirk kete bin çavdêriya normên navneteweyî

Di hiqûqê de kambaxtirîn rewş

Piştî ku KMME'ê giliya Tirkiyeyê li ba Konseya Ewrûpayê kir, li Tirkiyeyê jî kes û saziyên mafparêz bi dest kampanyayan kir. Bi giştî di kampanyayan de tê xwestin ku 158.159.312/2 û qanûna 8'an bêne guhartin.

Bi dîl girtina Serokê PKK'ê Abdulah Öcalan, pergala hiqûqî ya Tirkiyeyê, çî li qada navxweyî çî li qada navneteweyî, dibe sedema gotûbêjên dîvedirêj. Lewre qanûnên Tirkiyeyê di qada navneteweyî de tene darizandin. Ev yek, Tirkiyeyê dixwe tengasiyê. Ev bi salan e ku rayedarên Tirkiyeyê dibêjin: "Em welatekî hiqûqperwer û demokrat in." Ev dîtîna, pêşîn ji aliyê Serokê Qanûna Bingehîn Ahmet Nejdît Sezer, dîre jî ji aliyê Serokê Dadgeha Şewirmendiyê (danîştay) Erol Çırakman ve hate redkirin. Bi baweriya Sezer û Çırakman, ji bo ku Tirkiyeyê bikaribe di warê mafên mirovan de, li gorî normên navneteweyî tevbigere û ber bi demokratîkbûnê ve biçe, pêwîst e qanûna bingehîn ji binî ve bê guhartin.

Digel van rûdanan, Tirkiye hîn jî tesîra "qeyrana turbanê" rizgar nebûbû. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê giliya Tirkiyeyê li ba Konseya Ewrûpayê kir. Bi baweriya Parêzerê Öcalan Hasip Kaplan, eger Tirkiye li gorî prosedûrê tevnege, dibe ku serilêdana wê ya bo endamtiya Konseya Ewrûpayê, ji ber Doza Öcalan bê îptalkirin. Tirkiye, ev cara duyemîn e ku beramberî rûdanêke bi vî awayî dimîne. Li pey ragihandinan, Tirkiye di Doza Titina Loizidou de, ku piştî Tevgera Kibrisê mala wê li Kibrisa Bakur mabû, Tirkiye bi dayina 875 dolarî hatiye cezakirin. Hîn wê demê, ji ber ku Tirkiyeyê di dayina pereyan de problem derxistine, endamtiya wê ya bo Konseya Ewrûpayê hatiye niqaşkirin. Bi baweriya parêzerê Öcalan, ji ber ku wê dewleta tirk di doza Öcalan de, ne li gorî normên hiqûqa navneteweyî tevbigere, jixweber wê nedemokratîkbûn û nehiqûqîya qanûnên wê, jixweber dê berbiçav bibe. Li gorî nirxan-

andin komîsyonên biyanî, hiqûqnas û parêzerên Öcalan, Tirkiye li aliyekî bi gotinan xwe demokratîk dide nîşan, li aliyê din jî di Doza Öcalan de rêbazên ku heta niha ji aliyê tu dewletan ve nehatine bikaranîn, bi kar tîne.

Li aliyê din, li gorî lêkolînên Komeleya Mafên Mirovan (İHD)'ê, 146 kes ji ber dîtîna û ramanên xwe di girtîgehan de ne. Lê Tirkiye, li şûna ku di warê mafên mirovan û derbirina ramanan de, li gorî normên navneteweyî guherînekê pêk bîne, bi nêzîkedayîna astengirin û qedexekirinê qanûnên nû datîne. Niha li dora 152 qanûn û di ser 700'î re xalên qanûnan, li ber derbirina raman û darizandineke dadyane (adil) asteng in. Wekî mînak; Qanûna Komeleyan, Qanûna Lijneya Perwerdeya Bilind (YÖK), Qanûna Partiyên Siyasî, Qanûna Avabûna Dadgehên Ewlekariyê yê Dewletê, Qanûna Rewşa Awarte, Qanûna Çapemeniyê, Qanûna Têkoşîna bi Terorê re û Qanûna Meş, Çalakî û Civînan. Çî cara ku rêxistinên sivil û saziyên mafên mirovan guherîna van qanûnan xwestibe, rayedarên Tirkiyeyê mercên taybet ên Tirkiyeyê wekî sedem nîşan daye û li ber pêşketin û guherînan bûye asteng. Ev hincet, carina "xeternakiya komünizm"ê, carina "xeternakiya şerîatê" û carina jî "terora cudaxwaz". Di vî derbarê de, Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal di civîneke çapemeniyê de da zanîn ku, bi van sedeman ev bi salan e ku di warê mafên mirovan û demokratîkbûnê de tu gav nayên avêtin. Wî, diyar kir ku bi politikayên pêşdarazî û nîjadî, tu problem çareser nabin. Birdal, wê 3'yê meha pûşberê ji ber dîtîna û ramanên xwe bikeve girtîgehê.

ÇALAKIYÊN KAMPANYEYA MEHA GULANÊ

- ✓ Wê broşûreke li ser kêşeya xwe îfadekirina azad bê amadekirin.
- ✓ Wê afîşeke ku wêneyên kesên ji ber dîtîna û ramanên xwe ketine girtîgehê û bikevin girtîgehê bê amadekirin.
- ✓ Rêxistinên navneteweyî yê mafên mirovan wekî (FIDH, UAO) der barê kampanyayê de wê bîna agahdarkirin.
- ✓ Wê nivîskar û rojnameger bîna ziyaretkirin û ji wan bê xwestin ku der barê derbirina ramanan de nivîsan binivîsin û piştigiriya kampanyayê bikin.
- ✓ Di 28'ê gulanê de wê ji şubeyên KMM'ê "meşa azadiyê û derbirina ramanan" ber bi Enqerê ve bê lidarxistin. Her wiha di 30'ê gulanê de li Enqereyê wê mitînga derbirina ramanan bê lidarxistin.
- ✓ Ji ber ku di Birdal 3'yê pûşberê bikeve girtîgehê, di heman rojê de wê li Kızılayê li ber Abîdeya Mafên Mirovan daxuyaniyeke çapemeniyê bê ragihandin.
- ✓ Kampanyeya îmzeyan a bo derbirina ramanan, wê 1'ê kewçerê bo Serokatiya TBMM'ê bê pêşkeşkirin.



Yaşar. Kemal:

Dinya Tirkiyeyê rexne dike lê ne xema wê ye

Komeleya Mafên Mirovan, li ser van qewmînen nedemokratîk û neqanûnî, bi awayekî giştî li dijî qanûnên ku der barê darizandin, derbirina raman û mafên mirovan de astengiyan derdixin, bi navê "Azadî bo Derbirina Ramanan" kampanyayek da destpêkirin. Serokê Giştî yê KMM Akın Birdal 8'ê gulanê civîneke çapemeniyê li dar xist û bernameya kampanyayê ragihand. Birdal, got ku, ligel ku Tirkiye ji sala 1954'an ve aligirê Peymana Mafên Mirovan a Ewrûpayê ye, ji sedî sed mafên ku di peymanê de cih digirin, nade hemwelatîyên xwe. Wî, diyar kir ku, wekî kesane, bo dewletan jî "pê ewlebûn" û "li ser sozê xwe sekinîn" rêbazeke hiqûqî û etîkî ye.

Di heman civînê de nivîskarê navdar Yaşar Kemal jî axivî. Bi baweriya Kemal, tu carî mafên mirovan ji rojevê dernakevin. Kemal da xuyakir ku, her deh sala carekê mafên mirovan ên nû tene afirandin. Bo mînak, berê mafê xwezayê û zarokan tunebûye. Wî got, roj bi roj li darê dinyayê sînorên demokrasîyê berfireh dibin lê Tirkiyeyê tiştêkî bi vî rengî pêk nayê. Yaşar Kemal wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em niha di bin zordariyeke mezin de ne. An em dê bi axivîn bikevin girtîgehê, an jî em napeyivin. Ez ji girtîgehê xwe nadim alî. Ez ji bo azadiyê têdikoşim. Kêşeya Kurd jî beşek ji têkoşîna min a demokratîk e. Lê rojekê, ku fersendê bibînin, wê bi guhê me herduyan (Akın Birdal) bigirin û bavêjin hundir. Ji ber ku qanûnên Tirkiyeyê destura vî yekê didin. Hemû dinya Tirkiyeyê rexne dike lê ne xema wê ye. Deh salan jî me mahkûm bikin, tiştêk nagehere. Ez çiqas navdar bim jî Tirkiye dikare min mahkûm bike. Lê têkoşîna min wê bidome. Ji bo ku li Tirkiyeyê, ne şer lê demokrasî pêk were, ez dinivîsim."


Helwesta KT'ê ya li dijî raperînên berê û PKK'ê (2)

Îro îradeya Komarê nîn e, parçebûyî ye. Bi PKK'ê re danîna têkiliyan, vîneke xurt dixwaze. Îro her yek ji rêveberên KT'ê ji yê din ditirse. Kî biryareke wisa bistîne, yê di cih de xayîn were îlankirin an jî dê wekî Turgut Özal û Eşref Bitlis beramberî komployan bimîne.

Pîştî vê yekê, em dikarin helwesta KT'ê ya li dijî raperînên berê û ya li dijî PKK'ê rûberî hev bikin.

1- Di wê pêvajoyê de, ji bo şandina heyetan, înkarnakirina kurdan hinceteke bingehîn e. Yanê, ew, eşîrên kurdan parçeyek ji xwe dibînin û heta dibêjin, "mec-lîs a tirk û kurdan e." Lewre, ger heyet bihatana şandin, tu reaksiyonên neyinî ji nava Tirkîyeyê li dijî M. Kemal nedihatî nîşandayîn. Lê, rewşa îro berevajî vê yekê ye. Çimkî ev 75 sal in ku, ew kurdan înkarkirinê red bikin. Ev jî bi xwe re tunebûna KT'ê tîne. Lewre 'Komar' li ser înkarkirina kurdan hatiye avakirin.

2- Hêzên împeryalist ên mîna Îngilistan û Fransayê, wê serdemê pir li ser kurdan, li dijî rêveberên tirk sekinîbûn. Îro, dema mirov li rewşê mêze dike, piştî ku biyanî bi Kêşeya Kurd re mijûl bûn, rêveberên tirkan jî ji mecbûrî hin nixên kurdan qebûl kirin. Rêveberên Tirk, wê mîna salên 1920'î mecbûr bimînin ku careke din polîtîkayên înkarkirinê ji holê rakin. Bêguman, ev yek bi gurbûna şoreşê û bi



Dema ku şoreş lawaz bibe, tu hêz û dewlet bi Doza Kurdistanê re mijûl nabe û ne jî wê ji Tirkîyeyê biwêrin, behsa Doza Kurdistanê bikin.

syekîtiya hêzên Kurdistanê ve girêdayî ye. Jixwe dema ku şoreş lawaz bibe, tu hêz û dewlet bi Doza Kurdistanê re mijûl nabin û ne jî ewê ji Tirkîyeyê biwêrin, behsa Doza Kurdistanê bikin.

"ne kapîtalîzm, ne komûnîzm, heta hetayê kemalîzm"

3- Wê serdemê şovenîzm li Tirkîyeyê ewqasî xurt nebûbû. Bi şerê çekdarî re, ku di 1984'an de dest pê kir, şovenîzm ewqasî xurt bû ku, êdî mantalîteya mirovekî ji rêzê û ya rêveberê dewletê li ser Kêşeya Kurd de wekî hev e. Di vê rewşê de ger rêveberên dewletê bi kurdan re têkevin têkiliyê, xwe nikarin bidin jiyandin û wê ji navê bêne rakirin. Çimkî destpêka bi PKK'ê re lihevrûniştinê, di heman demê de destpêka rûniştandina pergala demokrasîyê ye jî. Rûniştandina pergaleke demokratîk jî taswîyekirina hemû nijdeyan (çete) e. Lewre tu nijde naxwazin PKK'ê re li hev rûnin. Ji bo ku li ser piyan bimînin, şovenîzmê xurt dikin û felsefeya "ne kapîtalîzm, ne komûnîzm, heta dawiyê kemalîzm" di dibistanên xwe de dikin darsa bingehîn.

4- Raperînên kurdan bi gelemperî herêmî bûn. Lewre em dibînin ku wê demê peywira walîfî, qaymeqamî û hwd. teklîfî serkêşên raperînan dikin. Lê belê, şoreşa îro ne tenê li Kurdistanê, her wiha li Anatoliyê jî xwe birêxistin kiriye. Ev jî girêdayî Serokatiya PKK'ê ye;

a) Serekên berê, xwe bi tevayî ji Osmanîyan an jî KT'ê qut nekiribûn. Heta piraniya wan serweriya xwe ya dema Osmanîyan dixwest. Lê, Serokatiya PKK'ê hêj di zarokatiya xwe de, xwe ji KT'ê û berjewendiyên şexsî qut kiriye.

b) Armanca Serokatiya Hemdem, serdandpê guhartina Rojhilata Navîn e. Bêguman,

ev girêdayî bîrdoziya şoreşê ye. Bîrdoza raperînên berê nikaribe vê yekê pêk bîne.

c) Rêveberên KT'ê difikirin ku wê bi hêsanî serekên îsyanan bixapînin, bidin tunekirin an jî bi xwe ve girê bidin. Lê, ev yek ji bo Serokatiya Hemdem ne pêkan e. Di vê mijarê de lixwemikurhatina wan berbiçav dibe, "ger em destê xwe dirêjî wî bikin, em nikarin milê xwe jê bifilînin." Ji her kesî bêtir rêveberên KT'ê di rastiya serokê PKK'ê û şerê wî ghiştine. Li hemberî serokatiyên berê tirseke wan a wiha tunebû. Ji tirsê wêdetir, hêviya wan ew bû ku, wan bi xwe ve girê bidin. Wan potansiyela vê yekê dîtibû û bi rastî jî hebû.

5- Di salên 1920'an de îradeyê rêveberên tirkan ku M. Kemal dinimand (tem-sîlîkirin), hebû. Îro îradeya Komarê nîn e, parçebûyî ye. Bi PKK'ê re danîna têkiliyan, vîneke xurt dixwaze. Îro her yek ji rêveberên KT'ê ji yê din ditirse. Kî biryareke wisa bistîne, yê di cih de xayîn were îlankirin an jî dê wekî Turgut Özal û Eşref Bitlis beramberî komployan bimîne.

Dê vîna gel qebûl bikin

6- Di salên destpêkê yê KT'ê de, mîna îro, bandora hêzên derve tunebû. Mustafa Kemal polîtîkayê hevkeşeyî, polîtîkaya hêzên biyanî bi giranî tîk bir û polîtîkaya xwe meşand. Jixwe "Komar" jî bi vê polîtîkayê damezirand. Îro rewş ne wisa ye. Ger rêveberên dewletê bixwazin bi PKK'ê re hevdiştin pêk bînin, divê bi Amerîka, Almanya, Fransa, Îngilistan û Îsrailê bişewirin. Çimkî ev dewlet li Tirkîyeyê xwedî hêz in û gelek navgînên hilberîna Tirkîyeyê bi rîya nijdeyên faşîst bi dest xistine. Lewre jî ji aliyekî ve lihevrûniştina PKK'ê û KT'ê heta radeyekê girêdayî hêzên navborî ye.

7- Di raperînên berê de, tevî ku pir

dom jî nekirine, bi şer re rewşa aborî-civakî ya Kurdistanê nediguherî. Ne gengaz bû bi serokatiyê feodal bihata guhartin. Îro, bi şer re civaka Kurdistanê serobin bûye. Gel êdî bi hişkî zelal, bi ser armanc û daxwazên xwe ve bûye. Vê guherîna civakî ya nû, ku bi şerê PKK'ê re hişyar bûye, baş nas kiriye. Lewre ew bi hemû hêza xwe li hemberî Serokatiya PKK'ê rabûn û wan piştgirîya KT'ê kir.

Belê, ji ber van sedemên ku me li jor rêzê kirin, xwe nêzikî lihevrûniştina digel PKK'ê nakin û heyetan naşînin cem Serokatiya PKK'ê. Lê ev rastî jî heye; ev kêşe dê teqez çareser bibe û wê bi Serokatiyê re li hev rûnin. Ev jî ne bi daxwaza wan e. Çimkî hemû sazîyên KT'ê pûç bûne. Sazîya leşkerî jî li hemberî gerîla bêçare maye. Jixwe propagandaya marjînalbûna PKK'ê, di rastiyê de marjînalbûna Artêşa Tirk û KT'ê ye.

Di encamê de mirov dikare vê bibêje; bi PKK'ê re qebûlkirina lihevrûniştina KT'ê, qebûlkirina Amerîka, Îngilistan, Almanya û Îsrailê ye, şkenandina vîna wan hêzan e jî. Ji bilî qebûlkirina îradeya PKK'ê, tu rê li ber wan nemaye. Pispore CIA'yê G. Fuhler wiha dibêje: "PKK xwedî piştgirîyê mezîne e, lê, pêwîst e kesên mîna Şerafettin Elçî di nav de cih bigirin." Xuya ye hêdî hêdî, di destpêkê de bi rengekî berevajî, dê vîna gelê Kurdistanê qebûl bikin. Dîsa di vê gotina Berpirsiyarê ERNK'ê yê Welatên Serbixwe Mahir Welat de, helwesta DYA'ê xwe baş dide der: "Ji bo ku em li hemberî xeta petrolê nebin asteng, Amerîkayê got emê piştgirîya aborî bo we bikin (Azadiya Welat, hej. 138)."

AHMET HÜSEYİN

AYDIN TAN

Rexne û mafnasî

Di hejmara 170'yî ya Azadiya Welat de nivîseke bi sernavê "Di serdema Komara Tirk de lêgerînên folklorê" ku ji hêla Mahmut Yamalak ve hatiye nivîsandin, hate weşandin. Yamalak bi kurtasî wiha dibêje: "Dîroka folklorê tirkan; dîroka dizîna ji folklorê Anatolî, Behra Reş, Trakya û Kurdistanê û li ser vê yekê afirandina çand û nasaveke nû ye. Di nivîsê de ji Ziya Gökalp heta P. N. Boratav gelek kes hatine rexnekirin. Li ser rûpel, berga pirtûka İlhan Başgöz hatiye bikaranîn, bi vî awayî, ew jî ketiye nava wan kesên navborî.

Di vê tesbîtê de aliyekî rast heye, lê tawanbarkirineke bi giştî di nava xwe de gelek neheqiyên jî dihewîne. Neheqiyekê bi vî rengî tu xêrê nagihîne me. Di ser de jî ew nêzîktêdayîn dibe sedema çewt-agahdariyê û bandoreke neyînî li nîfşên nû dike.

Em ji serî dest pê bikin. Berî ku tirk bîn Anatolîyê, li ezmên dijiyan? Çandêke tirkan a resen nîn e? Wan, ji cihê ku ew jê hatin qet tiştek bi xwe re neaniye? Wan tiştek nedilîst, stran nedistîrîn, çîrok venedigotin. Divê em her tiştê ku li dijî dîtina ku em dijberin, bi yekcarî rast nebînin.

Heke em dan û standina xwezayî ya di navbera gelan de deynin aliyekî, piştaftin û dizîna zêdetir di warê stranên gelêrî û lîstikên gelêrî ango dîl û govendan de pêk hatiye. Yek çawa dikare tiştên zargotinî bidize? Ewên ku navê wan hatiye dikirandin, çend kesên mîna M. Sarısözen û N. Tüfekçi ne tê de, giştî

kesên ku di warê folklorê xebatê dikin in.

Tiştê ku em pê êşiyên, ev e ku zanyarekî mîna P.N.Boratav ku xebatên qada navneteweyî de dengvedayî pêk anîne, yekser hatiye tawanbarkirin. Lê tê zanîn ku Boratav ji ber ku di xebatên xwe yê folklorê de ji bîrdoza neteweperest dîr ketiye û bi çavêkî demokratîk li çanda gelan nihêriye û ji marksîzmê sîd wergirtiye, leqayî pest û pêkutiyên hatiye. Ji ber vê yekê, ekola ku wî afirandiye ji zanîngehan hatiye vederkirin û li şûna wî dîtînen faşîstên mîna keça Tirkêş hatine bicihkirin. Bo nimûne, Boratav mijara ku nivîskar rexne dike, bi pêşbîniya zanyareke wiha tîne ser zimên:

(...) Misilmanên xwecihî ku bi eslê xwe ne tirk in; li herêmên rojhilat û li hinek herêmên din bi awayekî belavbûyî kurd; li başûrê rojhilat komikên ji nîjada samî (keldanî, alewî, nûsayrî û erebên sînî); li rojhilatê li qêrxa Behra Reş laz... Piraniya wan komikan, nêzîkê li cihê ku perwerdehiya seretayî û navincî belav bûye, bi lez û bez dibin tirk. Di nav nîfşên berê de kesên ku bi tenê zimanê xwe dipeyivîn jî hene. Nîfşên nû hinek bi du zimanan dipeyivin, hinekan jî zimanê xwe ji bîr kiriye. Lê ewê dab û nêrîtên xwe yê etnîkî demeke dirêj li ser piyan bihêlin û bihêwişin. Berhevkirin û nirxandina çanda wan bi hemû aliyên xwe, ji bo ronîkirina gelek gelsên

çanda gelêrî pir girîng e. Lê mixabin, di vî warî de ji bilî xebatên ku zanyarekî fransî Georges Dumézil ji çil salî vir de li ser çand û zimanê kesên bi binyada xwe ji Qafqasan e, lê li Anatolîyê bi cih bûne kirine, heta roja îro kesî tu xebat nekiriye.

Kêmasiya xebata di vî warî de bandor li berhemên wî nekiriye? Dema guhartoyên (Varyasyon) Destana Köroğlu dinirxîne vê kêmasiyê wiha tîne ser zimên: "Hejmara guhartoyên ku ji hev cuda li ser naverokên cuda hatine hûnandin û ristin dê piştî ku li Tirkîyê û li derveyî Tirkîyeyê (Tirkên Azerbaycan, Turmenîstan, Özbekîstan, Kazakîstan û başûrê Sibiryayê û kesên ku zimanê wan ne tirkî ye, mîna; tacîk û kurdan) li hemû guhartoyan hate kolandin dê derkeve holê. Lê ev kar hîn nehatiye kirin."

Ji ber ku ew xebata arşîvî dike, mirov dikare pîrseke wiha jî bike: Vê rewşê tesîr li berhemên wî nekiriye? Helbet kiriyê. Em vê yekê bi mîna keke li ber çavan raxin: "Di hinek qewmên tirk (wekî Kizgizan) de di navbera keç û xortên berzewacî de şer edet e. Kemal Bilbaşar di romana xwe ya bi navê "Cemo" de diyar dike ku ew edet di nava kurdên Anatolîyê de hê jî didome. Rastbûna vê agahiyê girêdayî rastbûna agahiyên ku Bilbaşar dane ye. Lê Boratav xwe ji pêşkêşkirina agahiyên wiha rast jî xwe nedaye alî. Dema çêlî salnameya gelêrî

tê kirin, ew agahiyên ku ji Mûşê hatine berhevkirin dide û wiha dibêje: Navê adar ku ji Mûşê hatiye berhevkirin ji zimanekî îranî (belkî kurdi) hatiye. Di farisî de azar e. Li ser binyata navên din jî mirov dikare dûvedirêj raweste. Lê tiştê ku pêşî balê dikişîne, di salnameya me ya gelêrî de navên mehan bandora danûstandinên gelan di xwe de dihewînin. Mirov ji bo İlhan Başgöz jî tiştên ku ji bo Boratav hatin gotin, dubare bike. Lê pêwîst nake. Tiştê ku em dixwazin balê bikişînin ser ê ev e: divê mirov xwe ji nirxandinên giştî bide alî.

Helbet li vir armanca me ne parastina Boratav e. Lê li holê encameke neyînî heye. Dema em evqas bi hêsanî ser kesên ku di pêşerojê de divê em ji rêbaz û encamên xebatên wan sîdê wergerin xêz bikin, ji vê yekê ne ew, emê ziyane bibînin. Îro peywira me ya yekemîn destavêtina karê berhevkirinê ye. Lê berpîrsê vê yekê ne em bin jî, em hê rêbaza vî başbaş nizanin. Ji bo hînbûna rêbaza vî karî emê serî li berhemên van kesan bidin. Divê em ji bîr nekin ku di berhemên kesên wiha de kakilê agahiyên li ser mijarê ya pisporên cihanê jî heye. Xuya ye ku divê em berhemên kesên biyan dubare nekin an jî wernegerînin. Ji ber ku berhemên zargotina kurdî xwediyê dirûv û çarçoweyê xweser in. Gelo divê em van kesan qet rexne nekin? Helbet emê bikin, emê bi tundî bi ser çewtiyên wan de herin, lê divê em aliyên wan yê erênî jî ji bîr nekin.

Çavkanî:

Prof. Pertev Naili Boratav, 100 Soruda Türk folkloru, Weşanê Gerçek, çapa duyemîn, avrêla 1984

Boratav, 100 Soruda Türk Halk Edebiyatı

Bajarên Kurdistanê

NEJDET BULDAN



E-mail:oramarbuldan@online.de

Li Ewrûpayê gelek gotûbêj li ser belediyeyên Kurdistanê tene kirin. Piranî jî di nava sazîyên Kurdistanê de. Di Rojnameya Özgür Politika, ku li Almanyayê tê weşandin de, her roj nivîsekê li ser belediyeyên ku HADEP'ê karkirî heye. Hind perspektîv in, hind jî pîrozîkirin. Dema mirov bi mijarê jî nîzaniye, dibe ku di gotin an jî nivîsên xwe de xeletiyên bike. Û rewşa Ewrûpa ne mîna ya Tirkîyeyê ye. An jî li Ewrûpayê şertên Tirkîyê û Kurdistanê baş nayên fêmkirin. Dîsa jî em ê li ser rewşa bajarên ku serokatîya wan keftiyê destê HADEP'ê bisekinin.

Bajarên Kurdistanê hatina wan a aborî kêm e. Di warê sinayî, tûrîzmê û dîrokê de bala raya giştî ya neteweyî û navneteweyî nakêşin. Ji ber ku ne bajarên pêşveçûyî ne. Berhemên dîrokî bi destê dijmin hatine helweşandin. Hingî li benda harîkariya Enqereyê ne. Hikûmeta navendî jî tenê harîkariya hevalbendên xwe dike. Bi gotineke din, hikûmet her dem piştigirtina belediyeyên ji partiyên xwe dike, belediyeyên partiyên din

tên cezakirin. Niha tu hikûmetên ku bîr çêkirin, dê dijminahiya serokên HADEP'î bikin. Hem bi aborî, hem jî bi siyasî. Di vê xalê de pêwîst e ku mirov bizane gelêrî cezakirin. Ku careke din dengên xwe nedin vê partiyê.

Berî hibijartinan serokên belediyeyan qaseyên xwe vala kirine. Ne tenê vala kirine, ew cihên bizanin ku HADEP'ê bi ser bikeve, ji bo çend salan deyndar in. Yanî hatina wan ya Banka Bajaran (İller Bankası) bi faîzeke giran ji bo çend salan kêşane û xwarine.

Hefte sal in tu xizmetên baş ji bajarên Kurdistanê re nehatine kirin. Ji bo karkirina sazûmanên sinayî, amadekirina rê û dirb, av û piran û hwd. xebateke bîngehî tune ye. Amadekirinên bîngehî ji bo hejmareke kêm e. Niha hejmareke mezin mirov ji gundan koçber bûne, hatine bajar. Ev zêdebûna mirovan jî pêwîstiyên wê girantir dike. Ji riyan heya avahiyan, ji tenduristiyê heya xebata aborî, bajarên Kurdistanê di nava rewşeke xirab de ne. Xizmeta bi dehan salan paşvematî, di çend salan da dibe ku sererast nebe.

Xebata serok bajarên Kurdistanê ne tenê kêmasiyên aborî û xizmetê ve girêdayî ye. Serokbajarî mewqîyê siyasî ye. Piranî jî li Kurdistanê cihê parastina nirxên neteweyî û mafên mirovatîyê ne. Rewşa dewletê jî li ber çavan e. Şerê qirêj gelek nîrx û jiyana civakî tevlihev kiriye. Tê guhê me ku hêsta amirên tirk desthilatiya serokbajaran nepejirandine. Kulturek civakî ye ku kesên tene hilbijartin, ji

aliyê memûrên dewletê ve jî tene pîrozîkirin.


Li hemberî wan kêmasiyên û yên me nîvîsî, xizmeta serokbajarên kurd, xwe parastin û xebata wan gelek zor e. Li pêşerojê dibe ku zehmetî û êrîşên dewletê zêdetir bin. Hingî wezîfeyên giran dikevin ser milên serokbajaran û hemwelatîyên wî.

Em dizanin ku gelê me tênehiyê (tiyê) xizmetê ye. Lê pêwîst e ku rewşa bajarên xwe, tengaviyên belediyeyên xwe û siyaseta dewletê jî baş bizanin. Bizanin wan çeperên mezin ên koletiyê şikandine. Parastina bajarên wan û partiya wan, ramana ku bi hilbijartin serkeftî karekî gelek mezin e. Li hemberî hemû kêmasî û êrîşan li siyasetanên xwe, serokbajarên xwe xwedî derkevin.

Serokên bajarên û endamên meclîsa wan jî bizanin ku ew wezîfeyên gel daye wan, wezîfeyêke muqades û pîroz e. Bi xwîne û rondikên çavan hatine avdan û avakirin. Kursiyên serokatî û nûnertiyê, li ser şewata gundan, koçberiya milyonan hatine çêkirin. Tiştê herî mezin ew e ku bizanin, kursiyên ku bi dest wan ketine bi îradeya gel pêk tê. Ew îrade û piştigirtin, dema çend sal bi ser ve çûn an sist dibe, an jî mezintir dibe. Li hemberî hemû kêmasiyên viyana gel pêwîst e. Evîna welat û gel li ser hemû xwestekên kesayetî ne. Dema kêmasî û serkeftinên xwe bi gel re parve kirin, dê di dilê gel de cihê xwe çêkin. Rêveberitiyê zelal û welatparêzî, dibe sedemên pêşveçûnên mezin.

Meh û Roja Şehîdan li dar e:

Ew şehîdên mirovahiyê ne



Ahmet Kesip

Halil Çavgun

Sultan Yavuz

Mehmet Karasungur

Haki Karer

Dîroka Têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê, dîroka şehîdan e. Têkoşîna hemdemî, li ser xwîna şehîdan bilind bû, bi pêş ket û her çû mezin bû. Têkoşîna, îro jî li ser xwîna şehîdan ber bi serfiraziyê ve dimeşe.

Partiya şehîdan PKK'ê, di komcivîna xwe ya çaremîn de, biryar stand û meha gulanê, wekî meha şehîdan ragihand. Dîsa roja 18'ê gulanê jî wekî roja şehîdan pejirand. Di meha gulanê de lehengên mîna Haki Karer, Halil Çavgun, Mehmet Karsungur, İbrahim Bilgin, Çar Lawên Êgir: Ferhat, Necmî, Eşref, Mahmut, lehengên Benavokê Ahmet Kesip, Sultan Yavuz, İhsan Çirkan (Mazlumê Biçûk) İsmet, Rüstem, Ferik, Ferhan û bi sedan şehîdên mayin, tev di meha gulanê de şehîd ketine. Her çiqas bi gelemperî meha gulanê meha şehîdan be jî, meh wateya xwe di 18'ê gulanê de dibîne.

Înternasyonalîstê mezin Hevalê Haki, di 1977'an de dema ku li bajarê Dîlokê (Antab) xebat dida meşandin, ji hêla rêxistineke sixur Stêrka Sor ve,

hate şehîdkirin. Di wê demê de neyar dixwest ku Tevgera Azadiyê-bikşîne nava tevgerê, dûvre jî êrişî ser bike û ji holê rake. Hêj Partî nehatibû avakirin. Gel hêj nû bîrdoziya sosyalîzmê nas dikir. Ji ber vê yekê jî neyar bi destê sixur û hevalbendên xwe, bi êrişên cur bi cur dibirin ser Tevgera Azadiyê. Ji aliyekî şovenîstên tirk ji aliyekî reformîstên kurd û ji aliyekî jî sixur û hêzên feodal êriş dibir ser Partiyê. Rêxistinên reformîst ên nijadperest, rastiya gel nedida ber çavên xwe. Berjewendiyên xwe û malbata xwe di ser her tiştî re digirtin. Dema Tevgera Azadiyê kêşeya neteweyî nîrxand û biryara çalakiyan girt, hêzên reformîst berê xwe dan Partiyê. Lewre ev yek li berjewendiyên wan nedihat. Hevalê Haki di bin van zor û dijwariyan de, bi vîneke xurt xebata xwe dida meşandin.

Ji bo şoreşê hemaltî kir

Hevalê Haki xwedî kesayetiyekê şoreşger û înternasyonalîst bû.

Lehengê kedê bû. Di jiyana wî de kêliyeke bêked tunebû. Wî, hemaltî dikir, da ku bi wan pereyan pirtûk û kovaran bikire. Devera ku Hevalê Haki biçuyê, birêxistî dibû. Taybetiya herî mezin a wî rêxistinkarî bû. Qiblegeha wî gel bû. Heta hetayê dilsozê Serokatiyê bû. Pêwîstiyên wê yekê, bi her awayî di jiyana xwe de pêk dianîn.

Çar Lawên Êgir di taritiya 12 Rezberê de zîndan ronî kir. Di bin zîlm û zora faşîzmê de agirê Çaran bû agirê jiyane. "Agirê Mazlûmê Newrozê" di laşê Çaran de wekî çirê pêket û geş bû. Ev biryareke dîrokî bû. Ev biryar, li dijî qirkirina dijmin, hezkirina jiyane bû. Dijmin dil dikir, bi riya şkenandîna berxwedana PKK'ê ya li zîndan, gelê kurd bişikîne. Lewre wê demê zîndan keheha berxwedanê bû. Serokatî li derveyî welêt, li hîcretê bû. Li aliye din têkoşerên Partiyê yên wekî hevalê Hayri û Kemal Pir dil bûn û ji ber vê yekê dijmin dixwest têkoşîna di zîndanê de bişikîne. Dijmin, ji bo vê yekê her cure rêbaz bi kar dianî. Bo mînak, dijmin komikeke bi navê "Genç Kemalistler (Kemalistên Ciwan)" ava kiribû, da ku girtiyên azadiyê bîne ser xiyane.

Agirê Çaran, di dema herî dijwar û kambax de, di serê dijmin de teqiya û ew gêj kir. Serok, li ser vê çalakiyê wiha dibêje: "Biryara Hevalê Mazlum pîkolya bo jiyane ye. Çalakiya Çaran biryara Mazlum bêhtir bi dest û pî kir. Bi qasî armanca biryarê, awayê wê jî girîng e. Divê bi her awayî bê nîrxandin û gel û têkoşerên me, vê yekê wekî rêbaza jiyane ji xwe re binîrxînin." Dilsoziya Çar Lawên Êgir ne dilsoziyeke ji rêzê ye. Di dîroka mirovahiyê de mînakên bi vî rengî ne gelek in an jî gelekî kêman in. Dema ku agir li laşê wan gur dibe, ew dibêjin: "Agir gur bikin!"

Çalakiya Çaran ne biryareke şexsî ye. Heta dawiyê parastina gel, rûmeta

Partiyê û parastina xeta Serok e. Dîsa Serok dibêje: "Biryara xweşewitandinê biryareke neteweyî ye. Ji bo jiyane hurmet, berxwedana mezin û biryara rizgariya neteweyî ye. Ev biryar, li hemberî jiyana şkestî û pûç, mezinahiya mirov nîşan dide."

Başûr û Bakur kelijand

Yek ji şehîdên meha gulanê heval Mehmet Karasungur e. Karasungur, bi xwîna xwe bakur û başûrê welêt bi hev ve girêda. Wî, dixwest dubendiyên di nav gel kurd û rêxistinên kurd de ji holê rake. Lewre heta ku gel di nava xwe de yekîtiyê ava neke, şerê li hemberî dijmin naçe serî. Hevalê Mehmet Karasungur, di duyê gulana sala 1983'yan de ji bo ku rêxistinên kurd li hev bîne diçe Başûr, lê belê ev rêxistin bi bêbextî Mehmet Karasungur û İbrahim Bilgin şehîd dikin. Hevalê Karasungur, di kesayetiyê xwe de yekîtiyê ava kiribû. Serleşkerê mezin bû. Ji serî heya dawiyê bi Serokatiyê re bû. Xwedî kedeke mezin bû.

Serok çawa li pey şahadeta Hevalê Baki Partî ava kir, li pey Çaran û Berxwedana 14 Tîrmehê re şerê çekdarî da destpêkirin û li pey Hevalê Egit jî ava kir. Îro jî li pey şahadeta Mehmet Karasungur re jî yekîtiya welêt tê danîn. Şoreş, bi qasî ku li Bakur bi pêş ketiye li Başûr jî bi pêş ketiye.

Dawiyê mirov divê tişteki bîne ser zimên. Şehîdê PKK'ê bi tenê ne şehîdê partî û gelê kurd in, şehîdê mirovahiyê ne. Dilsozi û girêdana bi şehîdan, bi xwepêşxistinê gengaz e. Wekî Serok dibêje: "Dilsoziya bi şehîdan ew e ku mirov di xeta şer de neşterê li hemû kêmasiyên xwe bixe. Girêdan bi vî rengî gengaz e."

GIRTÎGEHA BARTINÊ

LEŞKERÊ WINDA

*Ku heyetek diçe derekê
Ji bo gora Leşkerê Winda
Tacegulekê bi xwe re dibe
Sibêro eger
Bê welatê min jî heyetek wiha
Bipirse ji min "Kanî gora Leşkerê Winda?"
Dibê'm "Ezbenî
Li kêleka her cuhê
Li ser dika her mizgeftê
Her dêrê
Her şikeftê
Li ser tahtê her çiyayî
Li bin siya her baxî
Li Kurdistan
Li ser her bostê axê
Li bin her gazê ezmên
Şerm meke
Hin serê xwe daxê û
Deyne tacegula xwe"*

(Evdila Peşew)

Li ser navê malbata wî Selîme Keskîn



A. Hamît Keskîn (Tîrêj-Heqî)
1976- ...

Li NCM'ya İzmîrê

● 15.05.1999 şemî

Dîwana Dengbêjan: Xanemîr, Dengbêj Zahîro, Hozan Cezmî,
Dengbêj Reşîd, saet:17:00

● 16.05.1999 yekşem

Konsena Hozan Xanemîr, saet:17:00

● 19.05.1999 Çarşem

Konferans: Di Tekoşîna Sosyalîst de Serokatî, Beşdar: T. Demirer

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



● 21.05.1999 în

Konsera Koma Çiya

saet:18:00

Li BEKSAV'ê


● 15.05.1999 şemî

Fîlm û Guftugo: AX

Beşdar: Kazım Öz (Derhêner)

saet:17:00

ÇAVDÊRÎ

Ma Tovên
Stêrkan Diqelin?

SERKAN BRÛSK

Deva-deva di nava gel de xeberek digere. Her kes dibêje min ji kê bihîstiyê, ez nizanîm. Gotin wekî pizotekê ye, agirê sor bi xwe ye. Wey li wî, yê ku zû ji ser zimanê xwe biavêje. Nûçe, tehl û bi şîni ye, nexweşî û bextreşî ye, bi agir e, girtin û asaq e.

Xalê Bextreş jî, zimanê xwe di vî agirî daye. Xalo devê xwe hişk girtiye. Hêstirên ziwa ji çavên wî yên westiyayî dinuqutin ser hînkên wî yên qermeçî. Dilê wî bi rivînî pêdikeve û bi teqînî lêdide. Ew dilezîne, xwe li mala xwarziya xwe ku nêzikî çarşiyê ye, digire. Çend lib diranên wî yên dawî ku ne li hindama hev in, ji zoran di goştê argûşka wî de radibin. Dûxan ji nava serê wî radibe. Ber çavên wî zer dibe. Taqeta di kabokên wî de nema kare gewdeyê wî hilgire. Kabokên wî difisin. Xalo, xwe bi ser kopalê xwe, yê ku ji hecê bi xwe re anîbû de ditewîne. Xwe pê digire. Têvlî kopalê xwe, wekî deydikê dihejhije. Kofendîla egala wî vedibe û rîşikên wê dikevin ser rûyê xalo. Bi destê xwe yê çepê egala xwe diedilîne. Bê ku devê xwe vekê, bi hejandina serê xwe ji keçîka ku bi destê wî digire re spas dike û bi gavên teng dikeve rê.

Dema xalê Bextreş digihê dêhma Camiyê, dengê Melê Camiya Mezin dibihîze. Xalê Bextreş deng nabe xwe. Ew xwe li kerrîtiyê datîne. Lê bexwedîkên guhên wî perdeyên xwe ji vî dengî re nagirin. Û fêrbûna salan wî ber bi bangê ve dikişîne. Xalê Bextreş berê xwe nazîvirîne, guhên xwe bi rîşikên egala xwe dixitîmîne. Dengê bangê nema tê wî.

Ji ber ku agirê li ser zimanê wî şûna xwe dişewitand, wî nedikarî ya di dilê xwe de, bi zimanê xwe, bi dengê bilind biqire, di dilê xwe de, bi dengê ku tenê ew û yê ku muhatab e, bibihîze got: "E hema bi Xwedê ez nehatim û min limêj nekîr. Ma ne bes e? Ma heta kengî!? Ev çi derew e, ya em bi te re ne rast in yan jî, ew bi te re nedurist in, yan jî tu bi me her du aliyên re... tobe site-fîrillah. Lê bes e, ev mesele divê safî bibe. Ev çi henekpêkirin e. Ew jî xwe li banga te digirin, em jî, êdî bes e! Ev hezar û dused sal in, ku banga te ji guhên me nakeve û serê me jî ji erdê ranabe. Te ji bo me çi kir ha? Ev mabû te ev jî bi me kir. Na, bi navê Xwedê û Rebilalemîn êdî bes e".

Xalê Bextreş bi êşa şewata agirê li ser zimanê xwe bi ser hev de diqirmeçî. Ger ne ji kopal bûya, dê serê wî û piyên wî bigihîştana hevdu. Îskeleta wî nema heq ji barê xwe derdiket. Xalo bûbû mîna lepekî. Daxwaz û hêviya têkçûyî ya Seydayê Xanê, ku bi hunermendiya helbestvanekî di nava risteyên xwe de neqîşandibû, bi hemû giraniya xwe ketibû ser qopîka piştê vî kalikî.

Xalê Bextreş xwe digihîne malê, lê bi çi halî? Devê xwe venake. Ew naxwaze şewata li ser zimanê xwe têxe dilê xwarziya xwe, ya ku dilê wê bi agirê xuşk û birayekî şewitiye û berdeyam dişewite. Na, na, ew divê ji xwarziya ka xwe ya bi aqil re bibêje. Bangî wê dike. Wê li kêleka xwe dide rûniştandin. Destê xwe hêdika di ser porê wê re dibe. Serê wê bi kefa destê xwe yê qermeçî û nermikî miz dide. Şewata di nava xwe de bi carekê re bernade. Hewl dide ku kurpekurpa di nava xwe de bêdeng bike. Lawo dibêje: "Yekî ku çermê rûyê wî li ber seqema zivistanê qemerî bû û qemeriya germa tîrêjên havînê jî perdeya xwe ya reş avêtibû ser rûyê wî, xwe nêzikî min kir û ev agirê han xiste dilê min û pêre jî bê ku li pey xwe vegere bi riya xwe de çû. Keça min êdî zimanê min nema geriya, perê min şikestin û çavên min di riya ku ew bi gavên bi xwe ewle pê de diçe de, qerimî mabûn." Xalo kesereke tije êş dikişîne, mohra berxwedana şerên bav û kalan di nava kefa destên xwe de dişidîne; berdeyam li çavên xwarziya xwe dinêre: "Gula min, ger cihan, stêrk, ezman û gerdûn hebin, dê roj jî hebe. Û dê ev roj, di nava tu diwaran de hilneyê û dê careke din hilê".

Di Rojên Ciwanan de ciwan hunerên xwe pêşkêş dikin

15'emîn Rojên Ciwanan, ku ji aliyê Şanoyên Bajêr ên Stenbolê ve tê birêvebirin, didome. Bernameya Rojên Ciwanan, roja 6'ê gulanê, li Îskeleya Kadıköya Stenbolê bi şanoya "Stranên Ax"ê ku ji aliyê Lîstikvanên Kuçeyan ên Anatoliyê ve hate listin, dest pê kir.

15'emîn Rojên Ciwanan, wê heta 16'yê gulanê bidome. Di Rojên Ciwanan de her sal xortên zanîngehan, beşên şanoyê û yên amator hunera xwe pêşkêş dikin. Îsal di bernameya Rojên Ciwanan de konser, şano, pêşangeh û guftûgo cih digirin. Di beşa konseran de Tefvik Çimen û Navenda Perwerdehiya Hunerên Rind ên Peyrayê, cih digire. Di beşa Pêşangehan de Rıfki Demirel, wêneyên xwe yên "Boyaxên avîn" û Ahmet Demirbaş jî wêneyên xwe yên "Ji Darulbedayî heta Şanoyên Bajêr" pêşkêş dike. Di beşa guftûgoyê de, Turgut Yasalar, Mustafa Altıoklar, Fehmi Yaşar û Erden Kral li ser "Sînemayê", Derûnînas Metin Afat li ser "Tilyak û evîn"ê, Atilla Atay li ser "Li Tirkiyeyê rewşa dawîn a kovaren mîzah"ê disekin. Her wiha Selçuk Erdem, Erdil Yaşaroğlu, Okan Bayülgen û Zafer Alagöz jî wê wekî axivger beşdarî guftûgoyan bibin. Di beşa şanoyê de, wê 31 komên şanoyê listikên xwe pêşkeş bikin. Ev şano, pêşangeh, guftûgo û konser, wê di Salonên Stenbolê ên Kadıköy Haldun Taner, Üsküdar Müsahipzade Celal, Fatih Reşat Nuri, û Sehneya Gaziosmanpaşayê bêne pêşwazîkirin. Bilêştên van çalakîyan, wekî her sal, îsal jî bê pere ne.

Her listikek, di nava xwe de jiyaneke û pergalekê dihewîne.

Çend listikên şanoyê ku di Rojên Ciwanan de cih digirin, ev in: Savaş Baba (Bavo Savaş), İstanbuldan Manzalar (Dîmenine ji Stenbolê), Bir Dejinin Hatıra Defteri (Lênûska Bîranînan a Dînekî), Zenciler (Zencî), Phedre, Gılgamış, Yeşil Papağan Limited, Çingenenin Şarkısı (Strana Çingeneyê), Bir Garip Evlenme (Zewicîneke Sosret) û hwd.

Di nav van listikên şanoyan de, yên ku bala mirov dikişînin ser rewşa çeteyan a îroyîn jî hene. Ji van, listika şanoyê ya Yeşil Papağan Limited, rewşa çeteyan baş radixe ber çavan. Ev



listik ji aliyê Mehmet Baydar ve hatiye nivîsîn û ji aliyê Tolga Yener ve hatiye rêvebirin. Listik di buroya du kesên ku bi xwe çete ne de derbas dibe. Kî li ku derê serê wan dikeve belayê, tîm cem wan ji wan alîkariyê dixwazin; her du çete pîrsîrêkên van kesên ku ji wan alîkariyê dixwazin, bi bikaranîna çekê çareser dikin. Ew kesên ku tîm cem wan, giş jî navdar in: Hunermend, Karmend, Sporvan, Rojnameger, Siyasetmedar û hwd. Her kes tê serî li wan dide û ew karê wan diqedînin. Peyvek heye, dibêjin "Mar çêjîkê xwe naxwe", lê di vê şanoyê de ev peyv derbas nabe. Di listikê de her du kes, berê pêşîn endamên heman çeteyê yên ku gotina wan naynînin cih, dukujin û dûv re jî ew bi xwe bi hev dikevin, bi komployan hev û din bi avê de dibin.

CEMİL ANDOK/ STENBOL

Nivîskar û Rêveberê Partiya Çep ê Belediyeyên HADEP'ê dikarin

Serokbelediyeyên HADEP'ê nûnerên gel in. Ev mirov, di Doza Kurdistan de xwedî rol in, ger dewlet ji dil bi wan re diyalogê girêde. Bêguman Kêşeya Kurd tiştêkî gişftir e. HADEP dikare roleke mezin jî pêk bîne, ger dewlet bixwaze. Lê dewlet pir nîjadperest e.

HEVPEYVÎN: SERKAN BRÛSK

Tu dikarî hinekî ji me re bi giştî behsa Partiya Çep bikî?

□ Partiya Çep, xwedî dîrokeke pir kevn e. Par, sala 1998'an, me 90'emîn salvegera avabûna partiye pîroz kir. Partiya Çep, şaxek ji tevgera çep a cihanê ye. Dema ku di sala 1917'an de Şoreşa Oktoberê li dar ket, ew li dinyayê bi navê sosyal demokratên hatibû organîzekirin. Di wê demê de, çepên çepan, ev nav ji xwe re nermik dît. Wan, ev nav, wekî navêkî bêsîfat û heta mirov dikare bêje bînaverokek dît. Dûvre navê xwe guhart.

Her partiyeke çep, bi navê welatê ku jê ye, hate naskirin. Li Sovyetê, Partiya Komûnîst ya Sovyetê, li Fransa û li Spanyayê û li gelek deverên din, heman rêbaz bi kar hat. Çepên swêdiyan jî heman metod bi kar anî. Di destpêkê de, navê partiye "Partiya Sosyal Demokratên Çep yê Swêdê" bû, peyre di sala 1918'an de, ev nav hate guhartin.

Partiya Çep, partiyeke temendirêj e. Mirov dikare dîroka partiye bike du beş. Serdema yekemîn, ku ji sala 1918'an heta 1950'î ye, helwesta partiye kêm û zêde mîna partiye komûnîst ên cihanê ye. Lê piştî salên 1950-60'î, di nava partiye de hinek xetan xwe rexne kir. Wan, raboriya xwe rexnekir û danûstandinên xwe yê bi Sovyetê re di ber çav re derbas kirin. Di nava partiye de xetên wiha rû da. Mirov dikare bêje, partiye piştî sala 1960'î li dijî Sovyetê serxwebûna xwe ragihand. Ji wê rojê û vir ve, partiye karên pir hêja kirine.

Ji bo ku mirov bikaribe siyasetê biafirîne, gavên nû pêwîst in. Divê mirov bikaribe di hinek meseleyan de îdeolojiya xwe biguherîne. Bo nimûne, berê Sovyet wekî şablon bû. Hema her kesî ji Sovyetê polîtîka îthal dikir û li gorî wê dimeşiya. Ji bo her tiştî ev derbas dibû; ji bo meseleyên kulturî, aborî û sendikayî û hwd.

Lê piştî salên 60'î, partiye xwe ji nû ve saz kir û polîtîkayên xwe, bi xwe diyar kirin. Li pey vê yekê, partiye karên pir hêja kirin. Wekî mînak, partiye hemû rewşenbîr û akademîsyenên marksîst û yê ku xwe nêzîkî partiye didîtin, teşwîqî çêkirina projeyan kirin. Îro jî, ev xet berdewam e. Ger îro Partiya Çep, yek ji mezintirîn partiye Ewrûpayê ye, hinekî

jî deyndarê vê xwenûkirinê ye.

Em partiyeke komûnîst in. Em bi xwe, marksîzmê dixwînin, klasîk û dîroka sosyalîzmê dixwînin. Em dixwazin van yekan, li vî welatî, bi fikreke azad û hişkê gelekî rihet, li gorî rastiyên ku li vê civakê hene, têxin jiyane.

Li aliyê din meseleya demokrasiya navxweyî jî, ji bo me pir girîng e. Bi baweriyê me, sosyalîzm bê demokrasiyê, demokrasiyê jî bê sosyalîzmê nabe. Partiya Çep a Swêdê, meseleya demokrasiya navxweyî pir zelal kiriye û gihandiye pîvanên pir berz û bilind.

Di hilbijartina dawîn a li Swêd, rewşa partiya we çî bû? Tu dikarî hinekî behsa vê jî bikî?

□ Di hilbijartina dawîn de, me % 12'yê dangan girt. Ji partiya me 43 parle-


menter hatin hilbijartin. Ev ji bo me, ji bo çepan serketineke hêja ye. Niha jî, em ji derve ve, piştigiriya hikûmeta sosyal demokratên dikin. Me dil nekir, em bi sosyal demokratên koalîsyonê çêbikin.

Em pêşniyaran pêşkêşî hikûmetê dikin. Piraniya van pêşniyaran jî tene qebûlîkin. Bo nimûne, sosyal demokratên gelek pêşniyaran jî bo "civaka refah" jî hevalên me wergirtine. Projeyên di warê tendirustî û hîndekariyê de, dîsa organîzekirin û birêvebirina van xebatan, ji aliyê hevalên me ve hate pêşniyarkirin. Ev pêşniyar, bi dengên parlamenterên sosyal demokrat hatin pejirandin.

Di van salên dawîn de, partiya we dixwaze dest biavêje problem û arîşeyên derve. Danûstandina we, bi partiye çep yê cihanê re çawa ye?

□ Piştî hilweşandina Dîwarê Berlînê, tevgera komûnîst jî ji hev belav bû. Hevalê me jî, bi biryarekê, hemû tîkiliyên xwe yê navneteweyî betal kirin, ji bilî tîkiliyên bi welatên Skandinavyayê re. Çend sal, wisa bê tîkilî û danûstandin derbas bûn. Dûvre endamên me, hevalbend û dilxwazên partiye got, partiyeke wekî ya me, divê di meseleyên navneteweyî de jî xwedî polîtîka be. Partiyê jî ji nû ve dest avêt polîtîkaya derve. Niha jî em hatine qonaxekê ku, li Ewrûpayê bi navê Neu Ewrûpa Left Forum sazûmanekê ava bikin. Yanî Forûma Çepên Nû li Ewrûpayê. Ev wekî niv-internasyonalê ye. 17 partiye mezîn yê Ewrûpayê endamên wê ne. Di meseleyên navneteweyî de, em wekî blok, kom tevdiagerin.

Niha ev form, tenê di çarçoveya Ewrûpayê de ye. Lê partiya me dixwaze



Niha li Ewrûpayê bi navê Neu- Ewrûpa Left Forûm sazûmanekê bê avakirin. Yanî Forûma Çepên Nû li Ewrûpayê. 17 partiye mezîn ên Ewrûpayê endamên wê ne. Lê partiya me dixwaze tîkiliyên xwe firehtir bike û Kêşeya Kurdistanê, Filistin, Tîmûra Rojhilatê û Sehra Rojavayê, ji nêzîk ve nas bike.

Şerefxan Cizîrî:

Ke siyasî jî hilgîrin

liyan xwe firehtir bike. Ji ber vê xwezê ye ku, partiya me dixwaze Kêşeya Kurd û Kurdistanê, Filistin, Mûra Rohhilat û Sehra Rojavayê, nêzîk ve nas bike. Ev biryar, di kongreya me ya berî bi du salan de rojevê û di heman kongreyê de hate qebûl kirin.

Te behsa NELF'ê kir, ku Yekîtiya Partiyên Çep yê li Ewrûpayê Gelo HADEP jî nikare bibe endamê vê forûmê? Ji ber ku ev ji bo HADEP'ê gelekî girîng e, ku de wê xwe bo Ewrûpa û cihanê veke.

Belê. Me ev biryar ji hevalên HADEP'ê re pêşkêş kirine. Haya hevalan ji NELF'ê heye. Partiyên endamên vê yekîtiyê ne, me ew bo endametiya HADEP'ê amade kirine. Ger HADEP xwe amade bike û serîlêdana xwe bike, pêşî dê gelekî çavdêr beşdarî pêvajoyê bibe. Dûvre jî dê bibe endamê esasî. Niha manca me ev e ku em HADEP'ê nava hêzê. Dawiya dawî jî hevalên HADEP bi xwe ye. Berî her kesî divê vê endametiya bixwaze.

Wekî din jî HADEP divê bernaşîya xwe zelal bike û lê bixebite li ser nasnameya xwe têkiliyên xwe bi derve re bi pêş bixe, ger wiha be, ev jî bo Kêşeya Kurd pir baş be. Jixwe niha di warê teknîkî de jî gelek problem û müşkuleyên HADEP'ê hene. Îro gelek endamên xan girtî ne û gelekê din jî nikarin derveyî welêt. Çima girîng e? Ji ber ku HADEP'ê di hilbijartinan de belediya 40 bajarên bi dest xist û ev jî pir girîng e. Aliyekî din jî wê meselêyê jî siyasî ye.

Gelo ev nûner nikarin roleke sîyasî jî pêk bînin, çi di qada navneteweyî û çi jî di qada navxweyî de?

Rast e. Ev mirov ji aliyê gel ve xwe hinek hilbijartin û nûnerên gel in. Ev mirov di Doza Kurdan de xwedî xwe û rol in. Ger dewlet bixwaze, ev rastî dikare bi wan re diyalogê bi pêş bixe. Bêguman Kêşeya Kurd gelekî giştîr e. HADEP dikare rola xwe mezîni jî pêk bîne, ger dewlet bixwaze. Lê dewlet pir nijadperest e. Bi kurtayî dewlet bi xwe dikare hinek meseleyê çareser bike.

Bi qasî ez pê dizanim, têkiliyên xwe bi HADEP'ê re pir xurt bûne. Ev du car in ku, hûn tevî sekretêrê xwe yê giştî yê navneteweyî diçin Kurdistanê û bi rayedarên HADEP'ê li hev rûdin. Hûn di hilbi-

jartinan de jî li Kurdistanê bûn. Tu dikarî ji xwendevanên me re hinekî qala çavdêriyên xwe bikî?

Esas wekî min berê got, ev biryara me ya ku emê meseleya kurdan derxin pêş, ji mêj ve hatiye girtin. Hevalê me, di salên hefteyî de pêşniyar ji bo Kêşeya Kurd birine Parlemantoya Swêdê. Heta niha wisa bûye. Hevalên me pêşniyar birine parlemantoyê lê tiştên berbiçav çêbûne.

Piştî ku kongreya me biryar da, ku em Kurdistanê bikin yek ji wan xalên esasî ku emê piştigiriya wê bikin, çarçoveya alîkariyê di nava partiye de hate munaqesekirin. Û di dawiyê de, biryara ku em dê bi HADEP'ê re projeyan çêkin, hate dayin. Sala derbasbûyî, me projeya xwe pêk anî. Me dê di hinek aliyên de alîkariya wan bikira. Hevalên partiye biryar da ku ez, wekî nûnerê partiye jî sekretêrê navneteweyî û hevalek jî ji nava ciwanan em herin Kurdistanê. Em li dorê hefteyekê li bajarên Kurdistanê man. Me bi HADEP'yan re hevdîtîna pêk anîn. Ev, ji bo hevalên me yê swêdiyan ku dixwest partiye jî nêzîk ve nas bikin, pir baş bû.

Li vegerê, daxwaza hevalên ji me ev bû ku, em di hilbijartinan de jî biçin Kurdistanê. Cara duyemîn em li ser vê daxwazê çûne Kurdistanê. Lê, vê carê me nekarî em hemû programên xwe pêk bînin. Dewletê, rê li pêşiya me girt. Bo nimûne, me nekarî em xwe bigihînin meşa mezin ya li Diyarbekirê. Lê dîsa jî me bi awayekî berdewam, bi rîya telefonê têkilî bi ajansên navneteweyî, bi Parlemantoya Ewrûpayê re û deverên pêwîst re datanî. Ji forma ku me behs kir, piştigiriya pir xurt bo HADEP'ê hate kirin. Bi înzeya van 17 partiyan, faks ji Navenda HADEP'ê re hate birêkirin.

Tu dikarî encama hilbijartinê binirxîni?

Bi raya min, encam ji bo HADEP'ê pir serketî ye. Cara pêşî ye, dê gelê me xwe bi xwe îdare bike, dê kurd bajarên xwe bi rê ve bibin. Bêguman problemên bajarvaniyê hene. Ger serokên belediyan di nava gel de xizmetên baş bikin, dê encamên pir mezintir di pêşerojê de werbigirin. Dîsa hemû tişt ne aborî ye. Têkiliyên baş bi gel re gelekî girîng in. Jixwe hevalên HADEP'ê ji nava gel tî, bi baweriya min wê di

vî warî de problem dernekevin. Yê me jî çî ji destê me bê, em dê alîkariya wan bikin. Ev dikare di warê tecrûbeyên bajarvaniyê bin, dikare alîkariya siyasî be yanî çî ji destê me bê, em teqîr nakin.

Baş e. Tu dikarî hinekî jî behsa hilbijartinê bikî? Çawa derbas bû? Zehmetiyên ku dewletê deranîn pêşiya HADEP'ê çî bûn?

Ger HADEP, di zemîneke azad de, bêyî tade, girtin, îşkence û metodên antidemokratik, ku bi destên polîs û leşkerên dewletê di hate kirin, têketa hilbijartinê, wê HADEP'ê du car ji dengên xwe zêdetir deng girtibûna. Me ev bi çavên serê xwe dît.

Bi raya min, xurtiya HADEP'ê ev e ku, ew di nava gel de organîze bûye. Sebeb ev e ku, wê bi pereyêkî pir hindik, ku tîra komeleyeke partiyeke normal nake, hemû kampanyaya xwe meşand. Li aliyê din, berî hilbijartinê bi mehekê bû ku, dewletê digot em dê HADEP'ê bigirin. HADEP, di van şertan de beşdarî hilbijartinê bû. Lewre encama hilbijartinê ji bo HADEP'ê serketin e.

Tu bi giştî hilbijartina Tirkiyeyê çawa dibîni? Bo nimûne tu xurtbûna MHP'ê çawa dinirxîni? MHP ji Ewrûpayê ve çawa dixuye?

Niha bi raya min, li ser Kêşeya Kurd hemû partiyan Tirkiyeyê wekî hevdu difikirin. Ferqa di nava wan de pir hindik e. Erê, MHP xwedî raboriyeke faşîst e. Endamên wê beşdarî gelek qetliaman bûne, teror kirine, ku ew bi xwe jî ve înkâr nakin û dibêjin jî. Dîsa jî ev partiya dewletê ye. Mêjiyê van partiyan dewlet e. Dewlet, bi xwe nijadperest e. Rast e, MHP di hinek meseleyan de ji partiyan din bêhtir sistematîktir difikire. Hew ev e!

Li aliyê din MHP'ê xwe ji nû ve bi rêxistin kir. Piştî mirina Tûrkes, xwe ji bin tekela serokekî rizgar kir. Rewşenbîr û akademîsyên ku wekî wan difikirin, li dor xwe civandin. Partî, ji aliyê kesên ku di warê xwe de zana û şareza ne hate îdarekirin. Her wiha tîkoşîna li dijî PKK'ê ew pir xurt kir.

Ewrûpî, MHP wekî partiyeke mekroh dibînin. Dibêjin ev partî nikare Kêşeya Kurd çareser bike û wekî partiyeke faşîst jî tê binavkirin.


Ew, di sala 1955'an de li Başûrê Biçûk li Qamişloyê ji dayik bûye. Malbata wî, ji ber hinek meseleyên bi Dewleta Tirk re, derbasî Başûrê Biçûk dibe. Cizîrî, heta 6 saliya xwe jî li wir dimîne. Piştê malbata wî, derbasî Serxetê dibe û li Herêma Omeriyan dihêwîre. Zarokatiya wî, li gundên Omeriyan derbas dibe.

Piştî ku ew, di sala 1975'an de Lîseya Nisêbînê diqedîne, derdikeve derveyî welêt. Ji wê salê heta îro li Swêdê dimîne. Li Swêdê, xwe li dibistana bilind qeyd dike. Pêşî, beşa dîrok û siyasetê dixwîne. Piştî ku xwendinê tewaw dike, li ser rewşenbîrêkî Swêdî, bi navê "Nivîskarî û Îdeoloji" mastira xwe amade dike. Vê xebata xwe jî, dûvre wekî pirtûk çap dike.

Şerefxan Cizîrî, di ber xwendekariya xwe re jî, di nava tevgera kurd de, bi şeweyekî aktîf dixebite. Ew, ji sala 1981-82'yan heta îro, endamê Partiya Çep a Swêdê ye. Wî, di hemû şax û qadên partiye de, bi awayekî çalak xebat kiriye û bûye endamê gelek komîsyonên partiye. Cizîrî, li dora 12 salan serokatiya Belediye Hudîngenê kiriye, ku yek ji mezintirîn bajarên li dora Stockholmê ye. Di vê demê de, ew li ser demokrasiya herêmî radiweste.

Ev du serdem (dönem) in ku, ew ji listeya Partiya Çep, wekî çîgir-parlementer tê hilbijartin. Her wiha ew, di du kongreyên dawî de, wekî endamê navendî yê partiye hate hilbijartin. Niha jî, endamê komîteya karê derve yê partiye ye.

Di ber van karên siyasî re, Şerefxan Cizîrî karê rewşenbîriyê jî dike. Heta niha, bi zimanê kurdî û tirkî 4 pirtûkên wî hatine weşandin. 2 pirtûkên wî yê din jî di çapê de ne. Ku yek ji wan bi zimanê kurdî ye û li ser edebiyata devkî ya kurdî ye. Şerefxan Cizîrî, bêhtir li ser mijarên dîrokî, wêjeyî û felsefeyî dinivîse.



Ş. Cizîrî, Serokatiya Belediyeya Hudîngenê, ku yek ji girîngtirîn bajarên derdora Stockholmê ye, kiriye. Cizîrî, dema hilbijartinan li Kurdistanê bû. Bi dîtina wî, HADEP di hilbijartinan de bi ser ketiye û roleke dîrokî hildaye. Ew dibêje ji bo alîkariya HADEP'ê, çî ji destê wan bê ewê bikin.

Dembuhêrka miriyan

Q.DÊRSILAVÎ

Ho cîrano tu kî yî lo!...

Ez!...

Ez Mihemedê Biro me, ji gundê Zivingê me.

Wekî ku ez dizanim, gundê Zivingê dîrî van deran e. Çi karê te heye li van deran? Çima tu li goristana gundê wê hilneanîn? Qey hinekan tu anî doxtor û tu li vir mirî? Ma kesî te nebû ku te bi-bingundê te?

Na. Na... Çavsor û zaliman em ji gund û warên me penaber kirin. Ne gund ma ne jî goristan. Tev sotin. Em jî neçar man ku werin van deran. Piştî ku em hatin van deran, em bêkar û xebat man, jar û perîşan bûn. Ez zilamekî navsere bûm lê liserxwe û jîndar bûm. Di vî bajarê genî de di nava sê mehan de merezdarî bûm û mirim. Ji ber jar û tunebûnê ez neçûme doktor û dermanan jî. Wekî tu dibînî ez mirim, ez xistim vê behra bêbinî. Xwezî ez berî vê bi çar mehan bimirama, da ku ez li goristana Zivinga Şikaka veşartama. Wê sebra min bi Apê Silo û Xaltiya Sêvê bihata. Dê Meta Meyro ji me re tîr çîrok û çivanok bigotana. Min dê ev ecêb û sosret nedîtana. Îca ez li vî bajarê genî mirim. Ez xistim vê goristana bêser û bêbinî. Ji hezar û du mîletî tê de hene. Lê kes kesî nas nake. Wekî saxên wan mirî jî, kes li halê kesî napirse. Kes silavê li kesî nake. Serê ewil tîrsa min a mezin ji pîrsa Minker û Nekîr bû. Ku bi zimanê biyanî pîrsan ji min bîkin, kes nîn e ku ji bo min wergeriyê bike.

Ku mirov li gundê xwe be, ji zimanê wan fêm neke jî, dê yekî nas ji mirov re wergeriyê bike. Lê li vir ne kesî nas dikim, ne jî kes bi zimanê min dizane. De wele cihê ku Apê Simo lê be, ne hewceyî bersiva mirov e jî. Wî, dê ji ber xwe bersiva min ji wan (Minker û Nekîr) re bidaya. Jixwe Apê Simo, min bi 'dê û bav nas dike'. Dîtiye ku ez ji dayik bûme. Maşele, zimanekî fesih û durist li serê ye ku hakimî dibetîline. Jixwe hinekî xwendina wî jî hebû. Ê de ka li vî goristana bêserî û bêbinî, mirovê ku rû li kê deyne ku were bersiva mirov bide. Her yek bi halê xwe de ketiye. Hay û ilama kê ji kê heye? Tu dibê qey "gotinên wan bi zêran in" kes li rûyê mirov nanihêre û silavê jî li kesî nake. Ev bû du salên min ku ez li vir im, cara yekemîn e ku tu li min dipirsî. Herhal tu jî biyanî yî, ne ji van deran î? Peyva te dişibe ya Serhadê.

Rast e. Ez jî wekî te ne ji van deran im. Lê ew ruwê pêncî salî zêdetir e ku em li vir bi cih û war bûne. Kalê min wekî te nefî bû. Lê me xwe wînda kir. Em ketin nav çerxa ristê. Tu qiram û gumanên me jî nebûn. Piştî xortaniya xwe ez hinekî maldar bûm. Ketim mal û hebûneke qirêj. Me rebenî û belengaziya xwe ji bîr kir. Me dîrok û paşeroja

xwe ji bîr kir. Em ji ol û eşîra xwe dîr ketin, ji hebûn û rûmeta xwe dîr ketin. Ji welat û gelê xwe jî dîr man. Me qedr û rûmeta her tiştî bi pereyan pîva. Me got qey mirovî û jiyan tev pere ne. Dû re em bûn, qirdik û pêkenokê alemê. Lê "heta me xwe nas kir, me dawî xelas kir."

Lê mirina te çawa bû?

Ez nebêjim çêtir e... Lê ezê ji te re bêjim... Ji bîst saliya xwe şûn de ez maldar bûm. Min jineke biyanî anî. Sê zarokên min jê çêbûn. Min ew mezin kirin û hemû mal û hebûna xwe bi destê wan berda. Min got qey min ew kirine mirov. Lê min wekî bav û kalê xwe ji wan re qet behsa welat û gelê xwe, ol û kevneşopên xwe nekir. Wan jî xwe ji biyaniyan dihesiband. Tu hay û baya wan ji penaberî û rebeniya ku me kişandibû nebû. Wan digot ku qey Xwedê me wer maldar û dewlemend kirine. Piştî ku temenê min zêde bû, ez ji hal û taqetê ketim. Zarokên min li min nebûne xwedî. Ez avêtim ber derî. Hemû mal û sermiyan ji dest min girtibûn. Ez mame li ber deriyan, ketim nexweşaneyan û feqîrxaneyan. Nêzî du salan min wer kişand. Li guhê mizgeft û gastînan ez razam. Xelk û alemê jî nema ez nas dikirim. Du mehên dawî min xwe avête bêkesxaneya belediyeyê û li wir mirim. Ev şeş meh in ku ez mirî me. Lê dîsa ne kesî li min pîrsiye, ne ne qet!

– Lê ew xortê li kêleka te ya çepê kî ye? Tu bi zimanê wî dizanî. Gelo hewala wî çî ye?

– Ew jî kurê malbateke maldar û dewlemend e. Navê wî Hakan e, ji ber eroînê miriye.

– Guno, guno... Hin ciwan e jî. Çi eş û kulên xerîb li vî bajarî hene. Eroîn, DAS, qanser... yek ji van jî li welatê me tunebû.

– Ne das, AIDS e. A dîtir jî eroîn e ne eş û jan e. Ew dermanê serxweşbûnê ye.

– De çî dibe bila bibe! Lê min ew li welatê xwe nebihîstine. Ew ji na bedew ku li kêleka te ya dîn jî ciwan e. Gelo hewala wê çî ye?

Belê ew jî jinek bi nav û deng e. Di ciwaniya xwe de mala gelek camêran şewitandîye. Navê wê Gonca ye, dosta Evdikê Qereçî ye ku demekê bûbû celadê serê me kurdan. Ax û nîfirên me ew kor kir. Tevî hevalên xwe Hisikê Rafizî û Sadoyê çavbeloq ketibûn bin kamyonê hemû mirin. Lê Xwede rihê Sedoyê çavbeloq nestand. Go hîn tu yê kul û derdan pîr bibînî. Her ro du melkematên dest bi gurz tene ser wê jî-nîkê. Her yek, du heban lê didin. Deh tebeqa bi binê erdê diçe.

– Lê gelo ew xortê ku bi çend metra ji me wê de, ku her roj bi ax û girî ye, kî ye? Çî hewala wî ye?

– Belê... Birako ez wî jî ji te re bêjim. Kul û derdên wî jî pîr in. Ew ji vî bajarî ye. Li Çiyayê Bagokê hatiye kuştin. Li bajarê te, Mêrdînê endamê tîma taybet bû ye. Di şerekî taybet de, ku te jî dîtiye, pîr zilm û tade li bêçek û gundiyan kiriye. Di şerekî xedar de hatiye kuştin. Fermandar û malbata wî gotiye ew şehîd e. Wekî em dizanin "Şehîd ew e ku di ber xaka xwe û gelê xwe de bê kuştin". Lê rebenê min ev ruwê salekê ye ku hê hesabên gundê şewitî jê tê xwestin. Nikare bersivê bide. Hîn tade û lédana mirovên bêmedal maye. Hîn qetla deh şivanan maye. Hîn tecawuza jinên bêmedal maye. Hîn xirakirina teyr û turudan maye. Hîn qurmiçandina dehl û rezan maye. Hîn şewitandina firikê nok, nîsk, ceh, genim û zeviyan maye. Hîn bêheqîya cendekê miriyan maye. Hîn xitimandina çal û kaniyan maye. Hîn qirkirina pez û dewaran maye. Hîn hesabê yekê jî nedaye. Îca li xwe dixê û digirî. Dibê: "Ezê çawa hesabê van tevan bidim." Ji fermandar û malbata xwe re jî gotin û peyvên giran dike. Dibêje: "Ka we digot tu şehîd î, bê pîrs û sual cinefî yî?" Ma we çima wer ez xapandim? Ez lawikekî zîmirî. Çi tîkiliya min bi çiya û baniyên Mêrdîn, Hekarî, Şirnexê heye? Ma morikên diya min li wan deran qetiyabûn. Ew li ku, welatê min li ku. Em li war û welatê xelkê bûne bela. Bi ser de jî di cih û warên wan de, di gund û bajarên wan de me dikujin." Pîr poşman bûye. Carina bi ser halê xwe de digirî û wer dibêje: "Em jî çiqas ehmeq in. Ku serok û fermandarên me çî rê bi ber dixin, em jî bêguman dipejirînin. Em dibên qey rast e. Wan ji bo kêf û berjewendiyên xwe me sor dikin. Bera vî gelê mezlûm didin. Ê em tene kuştin, zar û zêçên me sêwî û jinebî dimînin. Ê dîsa jî hesab ji me tê xwestin. Bi rastî di vê rewşê de kêmasiyên me jî pîr in. Gava pîr pere dabûn me, gere me fêm bikira... Gava ku nav di me didan, em sor dikirin, digotin 'hîn leheng in û qehreman in', ger me fêm bikira. Perên ku didane me ne pîr bin jî, dîsa jî ji me aşên hemû karmend û karkerên wan zêdetir bûn. Ma me fêm nedikir ku ew anoşî ji bo çî ne? Me qet hişê xwe nedida serê xwe. Me ne digot ku gava li me bû pêsîrtengî, yewnanan bajarê me dagir kir, ew hatin bi me re mil bi mil yewnan ji bajêr rijandin deryayê. Em jî îro çûne li welatê wan cada kuştina wan dikin. Wan dikujin, talan dikin, dest davêjin namûsa wan, hemû mal û milkê wan dişewitînin. Dibêje de wele ku niha çî jî bi me bikin. Heq e...!"

– Xweziya min bi dilê te, tu bi zimanan zanî û bi hêsanî ji xwe re bi alamê re dipeyivî. Ez bawer im tu dengûbehsa dizanî.

– Belê, belê ez di vê goristanê de pîr

kesan nas dikim. Ê pîr jî dengûbehsa dizanim. Tu ha wî kêlikê spî dibînî? Ew jî mezêlê rojnamegerê tirk Hasan Tahsin e. Dema piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn ku Dewleta Osmanî tevî pêgirtinên xwe ve, bi bin ket, gelek ciwanên tirk xwest ku dewleteke neteweyî û serbixwe ava bikin. Ê bi kêmanî be jî bi ser jî ketin. H. Tahsin jî yek ji wan xortan bû. Gava ku Ewrûpayî ketin welêt, wî xwe ranegirt û bi demançêke biçûk li ber artêşê rabû. Bi wê demançêka xwe ya biçûk gule li wan barandin. Leşkeran jî di cih de ew kuşt. Îca ew xort, bû rûmet û serbilindahiya wan û hemû mîletê tirk. Lê wekî wî ji min re got, niha kul û derdên wî jî pîr in. Dibêje: "Me bingeha vê dewletê bi çî hawî avêt, daxwaz û armanca me çî bû, me çî dixwest û karbideşt û rayedarên niha çî dikin? Her tişt berevajî kirine. Em li hemberî Împeryalizmê bûn. Lê, yên îro her tiştê xwe teslîmî Împeryalizmê kiriye. Ev welatê ku me di ber de canê xwe daye, îro bûye pêgara hespê Împeryalizmê. Wekî were dikin çima ji me re dibêjin, leheng û qehreman. Ma ka qehremaniya me li ku ma? Ma gelê tu Silokê Cerdevan jî nenasî? Va cîranê me ye. Çend gavan li xwarê ye.

– Na wele ez wî jî nanasim. Jixwe navbera min û cerdevanan jî nîn e. De ka mesela wî jî ji min re bêje û em îşev razên bes e xewa min hat.

– Silokê Cerdevan ji Detiyalê ku bi ser navçeya Stewrê ve ye. Li gorî gotinên wî; zilamekî pîr hebaş û fesad bûye. Ji tevîhevî û dijîtiyê pîr hez kiriye. Her ro li cem çawîş û yuzbaşiyê qezê gîllî û paşgotiniya gundiyan kiriye. Çawîş û yuzbaşî jî pîr tade li gundiyan kiriye. Heta ku gundî neçar mane dibin cerdevan. Îca şerekê wan û şervanan rû daye, çend heb gundî û deh nefer mirine. Yuzbaşî jî suc xiste sitûyê Silo. Dibêje ku ne ji te bûya leşkerên me nehatin kuştin. Çira tu nehatî kuştin? Kîjan rojê be ezê te bikujim. Silo ji heta rihê xwe re çeka wan diavêje û direve, tê vî bajarî (îzmîrê). Li vir dikeve destê şervanan û wî mehkeme dikin. Sûc û kêmasiyên wî yeko yeko tîr tesbîtkirin û cezayê îdamê ji aliyê wan ve tîr înfazî kirin. Îca li xwe dixê û poşman e. Dibê min çî bi xwe û bi gundiyan xwe kir. Xwezî çavên min birijiyana û min ew suc nekirana. Ev çî sosret bû, ku min bi xwe û bi wan teva kir. Mirina min li der û çola bû. Xwezî ez li welêt teslîmî wan bibûma, belkî ez efû bikirama, ez efû nekirana jî, ezê li welatê xwe, di nav gel û cîranên xwe de bimirama. Belkî rojekî, yekî rehmet li min biamîna, ji min re fatihyek bixwenda. Lê mixabin, ez ji van tevan mehrûm û bêpar mam. Li vî welatê nenas û biyanî bêkes û ne bêxwedî me.

Şerê Yugoslavyayê rengêkî nû girt

Tê ragihandin ku, Rêveberiya Çînê dixwaze bi hinceta bûyera bombekirina balyozxaneya wê ya li Belgradê, di Kêşeya Kosovayê de bibe xwedî rolekê.

Bo nimûne rayedarên Çînê da zanîn ku ew jî dixwazin leşkeran bidin hêzên navneteweyî ya ku li Kosovayê bi cih bibin, lê divê ew hêz ne di bin kontrola NATO'yê de be, divê di bin kontrola NY'ê de bin.



★ BEŞA NÛCEYÊN DERVE

Êrîşên hêzên hewayî yên NATO'yê, ku li ser Yugoslavyayê pêk tîne, heftaya çûyî bi bombekirina li ser Balyozxaneya Çînê ya li Belgradê ku roja 8'ê gulana 1999'an pêk hat, rengêkî nû girt. Di bûyerê de 3 rojnameger hatin kuştin û 20 kes jî birîndar bûn. Rojnamegerên ku hatin kuştin yek jê nûçegihanê Ajansa Xinhuyê bû, yên jî bo rojnameya Guangmingê dixebitîn û di mîrê hev bûn.

Li hemberî vê yekê, gel û rêveberiya Çînê helwesteke tund nîşan da. Bi taybetî xwendekarên zanîngehên Çînê rabûn ser piyan û li hemberî NATO û Amerîkayê xwepêşandanên girseyî pêk anîn. Her wiha di van xwepêşandanên girseyî ku li ber Balyozxaneya Amerîkayê ya Pekîne pêk hat de, ciwanan êrîşî ser balyozxaneya jî kir.

Li ser helwesta tund a Çînê, Serokê DYA'yê Bill Clinton jî Çînê berorin xwest, lê rêveberiya Çînê ev xwestek bes nedît û lêborîneke fermî ji

NATO'yê jî xwest. Ajansa Xinhua di nûçeyêke ku li ser mijarê amade kiribû de, ev sernav bi kar anî "Gelê Çînê lêborîna Clinton bes nedît." Di nûçeyê de hatiye gotin ku dilê xizmên qurbanîyên bûyerê bi lêborîna Clinton rihet nebûye, wan piştgirî daye daxwaza Serokê Çînê Jiang Zemin, a ku ji NATO û Amerîkayê bi awayekî fermî lêborîne dixwaze.

Her wiha hatiye gotin ku heke êrîşên NATO'yê bidomin, dê gelek bûyerên bi vî rengî pêk werin. Li gorî nûçeya ajansa navborî nemaze kesên ciwan cezakirina kesên berpîrs dixwazin.

Rêveberiya Çînê bûyer anî rojeva Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî û xwest biryareke şermazkirina bûyerê ji NY'ê derve, lê endamên NATO'yê rê neda vê yekê, li ser vê yekê Çîn jî nahêle ku biryareke li ser Kosovayê ji Konseyê derve. Endamên NATO'yê dixwazin biryarekê li ser rewşa penaberan û alîkariya bo wan, ji Konseyê derxin.

Li gorî nûçeyên ku ji ajansên navneteweyî bi dest dikevin, vê bûyerê gira gelê Çînê ya li dijî DYA'yê der-

xistiye holê. Tê gotin ku nakokiya di navbera Amerîka û Çînê de ji mêj ve heye, lê bi vê bûyerê gurtir bûye. Tê ragihandin ku li gelek cihan sloganên wekî "Piştewaniya Yugoslavyayê bike, li hemberî Amerîkayê li ber xwe bide", "Bi Colayê dest bi berxwedana li hemberî Amerîkayê bike, êrîşî McDonald'sê bike." Hinek kes tirsaxwe li ser gurbûna hestên netewepêrest tînin zimên û didin zanîn ku hinek xwendekarên ewrûpî û amerîkî leqayî êrîşên xwendekarên çînî hatine.

Gelek çînî di wê baweriyê de ne ku Amerîka dixwaze li gorî dilê xwe pergalekê pêk bîne, li hemberî vê yekê Çînê wekî astenga sereke dibîne, lewre jî hêzên NATO'yê bi zanatî êrîş bi-riye ser balyozxaneya wan.

Li aliyê din tê gotin ku Rêveberiya Çînê jî dixwaze bi vê bûyerê di Kêşeya Kosovayê de bibe xwedî rolekê. Bo nimûne rayedarên Çînê da zanîn ku ew jî dixwazin leşkeran bidin hêzên navneteweyî ya ku li Kosovayê bi cih bibin, lê divê ew hêz ne di bin kontrola NATO'yê de bin, divê di bin kontrola NY'ê de bin.

DI ÇAPEMENIYA CÎHANÊ DE KURD

Bi çavên me re dipeyive

✓ Di rojnameya The New York Timesê de roja 11'ê gulanê li ser Licê bi şanên Stephen Kinzer nivîseke dîvedirêj hatiye weşandin. Gotinên şênî baş rave dikin. Yekî gotiye, "Tu dikarî me bibînî, lê tu nikarî dengê me bibihîzî lewre zimanê me xwe morkirî ye." Yekî din jî gotiye "Niha navçe mîna girtîgeheke ser vekirî ye. Em nikarin bipeyivin, em nikarin bêyî raçavkirinê tevbigerin. Lê dîsa jî em xwe azad dibînin, lewre azadî di derûniya mirovan de ye." Li ser hilbijartina berendamê HADEP'ê wekî serokê belediyyê jî yekî wiha gotiye: "Me xwest em hebûna xwe nîşan bidin, tiştê ku ji destê me dihat ew bû..."

Amerîka xistina rejîma Sedam daye ber xwe

✓ Ajansa Reutersê roja 10'ê gulanê cih daye nûçeyêke li ser Serokê YNK'ê Celal Talabani. Li gorî nûçeyê, Talabani di Rojnameya Al-Hayatê de gotiye, "Amerîkiyê sala 1999'an wekî sala guhartina rêveberiya Iraqê diyar kiriye." Talabani wekî sedema tîknêçûna rejîma Iraqê jî politikaya Amerîkayê ya çewt nîşan daye. Ew dibêje "Amerîkayê bawer dikir ku dê Sedam Huseyin bi derbeyê jî ser kar bê dîrxistin." Serokê YNK'ê wekî sedemeke duyemîn jî nebûna yekîtiya di navbera erebên şîî û sunî û kurdan de destnîşan kiriye. Wekî tê zanîn DYA jî bo hilweşandina rejîma Sedam pêşniyaz li PDK û PNK'ê kir, lê hêzên kurd hê helwesta xwe diyar nekiriye. Amerîkayê, ji bo vî karî 97 milyon dolar terxan kiriye.

Divê Öcalan li dadgeha navneteweyî bê darizandin

Endamê Kongreya Amerîkayê Frank Pallone roja 11'ê gulanê di kongreyê de axaftinek li ser Kêşeya Kurd û doza Öcalan kir. Pallone di axaftina xwe de rewşa kurdan û albanîyê Kosovayê daye berhev û bal kişandiyê ser helwesta neyinî ya Amerîkayê li hemberî Kêşeya Kurd.

Endamê kongreyê Pallon rola Amerîkayê ya di dîlgirtina Öcalan de jî rexne kiriye. Pallon di axaftina xwe de bal kişandiyê ser rewşa ku Öcalan tê de ye û êrîşên li ser parêzerên wî jî. Mebûsê amerîkî daye zanîn ku wî digel çend nûnerên din nameyek ji şanewankirinê re vekiriye û di wê nameyê de tê xwestin ku Öcalan li dadgeheke navneteweyî bê darizandin.

Şerbik tijî xizîne li ser bûkê birjîne

BERHEVKAR: EMER VESEK
HERÊM: BOTAN

Sarî zavano

(Ev stran, gava ku bûkê tînin, berbû li ser zava dibêjin)

Sarî zavano we şivano, sarî zavano

Serê şaşê gêlono

Xêlê te ji baqê gulan o

Çiyakê Eynêyo wey şivano, çiyakê eynêyo

Eyni eyn tevde têyo

Keçik ereba li deşta yo

Vê carê rast e wey şivano, vê carê rast e

Vê mihê şîr kir maste,

Ya te digot mi ji te re xwaste

Hinî li ber hinî wey şivano, hinî li ber hinî

Zava xemilî çû xwazgînî

Xêlî man bê firavînî

Biska kejêyo, wey şivano biska kejêyo

Bavêje nav diriyêyo

Me bûk anî ji Bafê yo

Biska hiriyê wey şivano, biska hiriyê

Bavêje nav deviyê

Me bûk anî ji Tarûniyê

Wa li ber conî wey şivano, wa li ber conî

Hersê baskê zer zironî

Tarî nebû zavê kire ronî

Çiyakê belavê wey şivano, çiyakê belavê

Vê berfê, vê lêlavê, hê keça wa li mala bavê

Home li ber weyo şivano, home li ber home

Van pisma (bizina) lex bike kome

Me anî anî wey şivano, me anî anî

Me li derê xênî danî

Wey saçarî (sed carî) pîroz li wî canî

Qaza qelandî wey şivano, qaza qelandî

Wey dotmamê xêl gerandî, wey derê malê reşandî


Qaza hûrkirî wey şivano, qaza hûrkirî devê malê morkirî

Wey dotmamê govend xweşkîrî

Çil û çil derzî wey şivano, çil û çil derzî

Çima tu bi lez î wey şivano, çima tu bi lez î

Emê ji te re bînin, wey şivano keçika bi kezî



Te du bira ne, wey şivano, te du bira ne

Herdukên wek şêran e, wey şivano

Şabaş ji mitirba ne

Te di xwihik in wey şivano, te di xwihik in

Herduk xirnik in wey şivano

Şabaşê mitirban, li nik in

Xurcîk li dorê wey şivano, xurcîk li dorê

Ne kire ne kiryar e, wey şivano

Heta koçer werne xware

Va ye bi me re wey şivano, va ye bi me re

Derê mala me re hate wey şivano

Dotmamê bi tirkî axaşte

Nebê min nîne wey şivano, nebê min nîne

Şerbik tijî xizîne, wey şivano

Ser serê bûkê de birjîne

Dayka delal e, tê rûnê pesiya li mal e

Daweza şivan li xal e

Dayka cindî ye, tê rûnê ser kursî ye

Daweta şivan li gundî ye

Refik çêke wey şivano, refik çêke

Komek zengilok çêke

Xêlê şivan bi rê ke

Vê carê newe wey şivano, vê carê newe

Kevnîka ketî stûwê, qurbanke dayik û xesûwê.

Heval avka ser hinarê

(Ev stran, dema ku bûkê ji hundur derdixin, ji aliyê hevalên bûkê ve tê gotin.)

Dor kaniyokê bi neferê, lê leylanê ho leylanê
Nefeşe çardeh pele, daykê kor e ne li mal e
Mexelê pezê kel e, leylanê ho leylanê

Dor kaniyokê şebes e, leylanê ho leylanê
Dor kaniyokê bi şebes e daykê korê ne li malê
Mexelê pezê reş e, leylanê ho leylanê
Mexelê pezê reş e, daykê korê ne li malê

Dor kaniyokê kuncî ye, leylanê ho leylanê
Dor kaniyokê kuncî ye, daykê korê, ne li malê
Mexelê pezê spî ye, lê leylanê ho leylanê
Mexelê pezê spî ye, lê dayikê korê ne li malê

Hey hevalê hey delalê, hey hevalê hey delalê
Hey hevalê hey delalê, hey hevalê hey delalê
Sisê bozê sisê bozê
Sisê bozê çav xezalê

Heval hevala kaniyê delal delala kaniyê
Kezî dirêjin, kezî dirêjin, kezî dirêjin ser panîyê
Xwedê nedê, Xwedê nedê, Xwedê nede dê û
baviyê
Heval dane heval dane, heval dane xerîbiyê

Heval hevala qirşîka, delal delala qirşîka
Kezî dirêj in, kezî dirêj in, kezî dirêj in, ser memî-
ka
Xwedê nedê Xwedê nedê, Xwedê nedê van metîka
Çawa keç dane gundîka, çawa keç dane gundîka

Heval avka ser hinarê, delal avka ser hinarê
Xwe di gelî de, xwe di gelî de, xwe di gelî de
berda xwarê
Ma kî çavreş, ma kî çav reş, ma kî çav reş çil
hivazê
Zozan çav reş, zozan çavreş, zozan çav reş çil
hivazê

Heval avka, heval avka, heval avka ser berîwê
Ma ew kî, ma ew kî, ma ew kî çavreş cil di ruwê
Zozan çavreş, zozan çavreş, zozan çavreş cil di
ruwê

Ez tawî me, ta digirim

Roj bi roja xerabtir im

Gava ez çav bi lawikê xwe dikevîm

Ez dikarim heft bar xwêkara şil hilgirim

Hawar e gundîno qiyamet e

Bejna zirav xeyidî bi ser rê kete

Kesê here wê vegefirne

Hem xêr e hem hem jî minet e

Eba reşo eba keji

Soz û qerara nede ji bo tu kesî

Ji niha heya biharê

Ezê dayika xwe bikime xesuwa te jî

Behra Wanê li min şîn kir

Du kevokan tê de sobanî kir

Ez nizanîm delalê dilê min,

Li kîjan welatî leşkerî kir

Çavên min li rêka berwar e

Serê min ji qitana zîv û zera xwar e

Wextê çavê min bi bejna zirav dikeve

Destê min ji xebata mala bavê min

sipîsar e

Were mala bavê min Eysayê

Ezê deynim ber te nan û çayê

Heke gote 'ma helawa Cizîrê nîn e'

Malxerabo mala bavê min feqîr in, ji

wan nayê

Tavî hat û ji ezmana

Şirik hevîkin ji kun bana

Xwezî Xwedê miradê miradxwaza biki-

ra

Yê min bejna zirav weke Leyl î

Mecnûn

Her du stêrikê li ezmana

Payizok


Hejmara 29'an a kovara Nûdemê derket

Kovara hunerî, edebî û çandî Nûdem bi hejmara xwe ya 29'an derkete pêşberî xwendevanên xwe. Her wekî hejmarên berê vê hejmarê jî pêşeka xwedî û berpîrsê kovarê Firat weberî dest pê kiriye.

Cewerî di vê nivîsa xwe de digel giranîyên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, li ser helwesta tund a rayedarên dewleta tirk jî rawestiyaye. Wî diyar kiriye ku dîkînetina Öcalan di nava kurdan de çawa yekîtiyê pêk aniye, lê li hemberî yekê di nava tirkan de jî hestên şovekî û înkarkirina hebûna kurdan jî berê xurtir bûne. Di dawîya nivîsê de hatiye rawestandin ku kurd li hemberî vê helwesta xwe doza ziman û çanda xwe wekî aqilî bilind bikin û li her cihî bi zimanê xwe bipeyivin.

Di nava rûpelên vê hejmara Nûdemê de nivîsên ku pêşî balê dikişînin, nivîsên polemîkî di navbera Murad Ciwan û Mehmed Uzun de ne. Murad Ciwan di nivîsa xwe ya bi sernavê "Nivîskarê xwedî yê ku zimanê kurdî afirand" de hîkayên ramanên Mehmed Uzun ên ku wî di hevîzîyoneke swêdî de li ser çand û wêneya kurdî pêşkêş kirine, rexne kirine. Murad Ciwan ku jî nivîsa Ciwan tê fêmkirin Mehmed Uzun her tişt jî xwe daye rawestandin û kesên berî xwe bi tiştêkî ne-berawestandin.

Mehmed Uzun di bin sernavê "Genevê bênefer ku xwe tiştêkî dihesibîne" de



bersiva Ciwan daye. Di destpêka nivîsa xwe de Mehmed Uzun bi şeweyekî tund bi ser Ciwan de çûye û piştê jî daye zanîn ku wî bi qestî, gotinên wî berevajî kirine. Piştî vê yekê li gorî xwe şiroveya rast a wan gotinan pêşkêş kiriye. Di wan nivîsên polemîkî de tiştê ku mirov pê diêşe şeweza M. Uzun e, lewre wî jî bersivê wêdetir êrîşî kesayetîya Ciwan kiriye. Tiştêkî din î balkêş jî di nivîsa Mehmed Uzun de navê Kurdistanê qet neha-

tiye bilêvkirin û bakurê Kurdistanê wekî parçeyekî Tirkiyeyê hatiye pêşkêşkirin.

Ji bilî van nivîsan, di nav rûpelên kovarê de nivîsa Şerefxan Cizîrî ya li ser wêneya devkî û nivîsa Medenî Ferho ya li ser wênesazê kurd Bahram Haco balê dikişînin ser xwe. Şerefxan Cizîrî di nivîsa xwe ya bi sernavê "Edebiyat an jî kultur" de digel taybetmendiyên wêneya devkî, têkilî û cudatiya wê ya jî wêneya nivîskî jî li ber çavan radixe. Medenî Ferho jî digel danasîna hunermendê kurd ê navborî, ketiye nava deryayê hunerê û tê de noq bûye. Ferho li ser hunera Haco û rêbazên hunerê agahiyên balkêş dane.

Di vê hejmara kovarê de nivîseke şayanî bahsê jî, nivîsa Hafîz Qazî ya bi sernavê "Serpêhatiya derxistina du kovaran" e. Her wekî jî sernavê wê diyar e, Qazî qala serpêhatiye derxistina kovarên Hîwa û Ronahî ku di nîveka duyemîn a salên 1950'yî de li Başûr derketine, dike.

Di vê hejmara kovarê de du kurteçîrokên jî cih girtiye. Çîroka yekemîn jî hêla Husein Muhammed ve hatiye nivîsandin û çêlî jiyan mirovekî seyr dike. Navê vê berhemê "Nemir" e, çîrok

serpêhatiya mirovekî ku li ser nifira hevvalêkî xwe, bi nemirîniyê hatiye cezakirin dike. Li gorî nifira ku li wî hatiye kirin heta ew zanîgehê neqedîne dê nemirê û jî sala 1398'an bi vir de lê dixebite ku beşeke dibistanê biqedîne, lê bi ser nakeve. Navê kurteçîroka duyemîn "Dilşewitiyê kultura kurdî" û jî hêla Silêman Alî ve hatiye nivîsandin. Di vê kurteçîrokê de bi serpêhatiya hunermendekî xisleta kurdan a bi rengê "xwedîdemeketina li mirovên şareza di jiyana wan de" hatiye rexnekirin.

Di vê hejmara Nûdemê de gelek helbestan jî cih girtiye. Kesên ku helbestên wan di vê hejmarê de hatine weşandin ev in: Çar şîr ji Sabah Kara, Rojen Bernas (Guno! Guno!), Rênas Jiyan (Jan), Du şîr ji Osman Mehmed, Kawa Nemir (Mîrtîbekê bajar da hev), Cemîl Denlî (Piştî çûna te), Munzur Uzun (êş), Remezan Alan (Êşa kevin), Zekî Seyda (Bipê).

Di dawîya kovarê de jî danasîna hinek berhemên cih girtiye. Di nava wan danasînan de mirov dikare danasîna pirtûka Konê Reş a bi navê "Jiyan û ramanên Celadet Bedir-Xan" ku jî hêla N. Zuxuranî ve hatiye kirin, wekî nivîseke serbixwe binirxîne. Lewre ew nivîs jî qalibê danasînê derketiye û tê de gelekî bi berfirehî li ser dîroka malbata Bedirxaniyan û Celadet Bedirxan hatiye rawestandin.

SAMÎ BERBANG

Dergûşa Demokrasiyê

OSMAN ÖZÇELİK



Divê mirov hilbijartinên 18'ê avrêlê mîna mîladêkê bipejirîne. Mîlada destpêka îdarekirina xwe, ya bi nasnameya xwe ya eşkere.

Di hilbijartinan de HADEP'ê benda jî sedî dehan derbas nekir û mecala ketina parlamentoyê bi dest nexist. Ger estenga bendê tune bûya, dê berendamên HADEP'ê bibûna parlamenter. Dilxwaz û hilbijêrên HADEP'ê bi vê rewşê xwegîn bûn. Belê, encama hilbijartinê belediyyan bû mizgîneke şahiyê. Li 7 bajar (ku yek jî wan belediyya bajarê mezin e.) Li 18 navçeyan û li 12 bajarokan (belde) serokatîya belediyyan HADEP'ê bi dest xist. Serokatîyên belediyyên Dêrsim, Îdir û Mêrsînê bi listikên hejmartina dangan jî dest çûn. Bajarê Mêrdînê, bi çend sedek deng winda bûn. Navçeya Gîhadînê (Agîrî) bi hîleyan ket destê partiya Fazîletê. Li gelek bajarokan û navçeyan, serokatîya belediyyan bi dest neketibe jî piraniya meclîsa belediyyan jî endamên HADEP'ê pêk tê. Li

gelek bajarokan di meclîsa bajêr de HADEP bi hêzeke xurt tê temsîlkirin.

Partiyên bi tecrûbe, di hilbijartinên herêmî de bi rol û tesîra navê berendamên dizanin. Gava mirov li belavbûna hejmarên dangan mîze dike, dibîne ku gel dengên xwe daye berendamên parlamentoyê, daye meclîsa belediyyê, belê nedaye berendamên me yên serokatîya belediyyê. Divê mirov nebêje gel dengên xwe tenê ji bo xatîrê partiyê dide û em kê bikin berendam, encam nayê guhartin. Ev dîtîneke şaş e. Dengên hilbijêran ne di bin tapûya kes û partiyên de ye. Me çendek bajar bi vî awayî winda kirin. Roja ku daxwazên gel bi cih nayê, gel mirov serpiştê li erdê dixê. Ji ber ku armanca vê nivîsê ne li ser rawestandina kêmasiyan e, emê kurt bibirin.

Di destpêka hilbijartinan de me ji raya giştî re gotibû; ji me re ketina parlamentoyê girîng e û em dixwazin ku pirsgirêkên civakî bi awayekî demokratîk di parlamentoyê de bînin nîqaşkirin û bînin çareserkirin û me gotibû maka pirsgirêkan, Kêşaya Kurd e.

Me tiştêkî din jî gotibû. Me gotibû hilbijartinên herêmî jî ya parlamentoyê girîngtir in. Ji ber ku rêveberîya herêmî, destpêka avakirin û bicihkirina demokrasiyê ye. Her kes qebûl dike ku rêveberîya herêmî, dergûşa demokrasiyê ye.

Ger em demokrasiyê bi rêkûpêk dixwazin û em dixwazin Kêşaya Kurd bi

riyêke demokratîk çareser bibê; berî her tiştî divê em di rêveberîya belediyyan de bi serkevin.

Tesîra tîkçûn û biserketina me, wê ne mîna partiyên sîstemê bisînor be. Tîkçûn, wê hest û baweriya gelê me ji binî ve bihejîne. Biserketin jî wê dilnexwazan rûreş derxîne. Dilnexwaz dibêjin kurd, nezan û hov in, ew nikarin xwe îdare bikin, pêwîstiya wan bi me heye.

Em jî dibêjin Na! Em ne kêmir tu kesan in û em dikarin rêveberîyêke biserketî û demokratîk bimeşînin.

Di tîkçûna sedsalan de, cara yekem şansêk bi dest ketiye ku em îspat bikin ku em têra xwe dikin. Em dikarin bêjin pira navbera paşeroj û pêşeroja me wê bi kevîrên bi serketina rêveberîya herêmî ava bibê.


Çavê raya giştî ya dinyayê li ser me ye. Asteng çiqas zehf bin jî şertên biserketinê hene.

Gel bi bawer, bi hêvî ye û piştigiriyeke xurt dide.

Rêveberîyên me yên belediyyan her çiqas bêtecrûbe bin jî piştî me ji wan rast e. Lê ku em destên xwe bidin hevdu û em bi wan re alîkar bin.

Bila tu kes berjewendiyên xwe yên kesayetiyê nede pêş. Roj roja xebatê ye. De werin em dergûşa demokrasiyê bi hevdu re bihejînin.

Ne radyo ye dijmin e!



zivêr dibin, ji kirasê xwe derdikevin. Ji hev û din re dibêjin: "Kuro ev makîne halko (halo) jî sixêfan dike

Mêrik: "Keya ne radyo lê dijmin aniye gundê me... De lê vehewin..." Gundî gişt lê dicivin. Bi kevir û daran radyoyê hûr-hûrî dikin û davêjin ser sergo.

Demjimêra Gozê

Gundiye herêma Mêrdînê wekî xwarina sewalan a zivistanê, ji serê meha gulanê ve giyayê ter diçinin û dikin rêsî. Xelilê Dûnê, her sibe bi berbangê re, tevî zarokên xwe diçû çiya, rêsiyan. Xelilo ji jina xwe Gozê re dibêje: "Ka mirîşkê û çend hêkan bide Heçî Felemez (H. Felemez minibus di navbera Stîlîlê û Nisêbînê de dixebitand). Bila ji me re demjêmerê bi zengil bikire û werîne. Dê her sibeh, me di wextê de hişyar bike."

Gozê dibêje: "De ne hewce ye em xesarê bikin. Jixwe bi her berbanga sibê re mîza min tê. Ezê we hişyar bikim."

Gozê du-sê rojan bi hatina mîza xwe re wan hişyar dike.

Dîsa rojê şîva wan goştê dermalan

bûye. Gozê bi ser şorahiyê de gelek av vexwaribû. Hîna nivê şevê ye, mîza wê tê. Bi lez û bez bang li Xelilo û zarokan dike. Dibêje: "Rabin, bûye sibeh. Hûn dereng mane."

Xelilo û zarok radibin. Berê xwe didin çiyê. Lê li wan nabe sibe. Bi ser de tavek baran jî li wan dibare. Hinek ji wan dikevin binê berqefkê. Hinek ji wan dikevin bin deviyân. Ji serma laşê wan diricife. Çongê wan dilerizin. Zarok dibêjin: "Yabo! Ev çi hal e? Em ji serma qefîlîn." Dibe kufe-kufa Xelilo û li wan vedigerîne: "Lawo; heta ku demjimêra me hatina mîza diya we be, wê halê me ev hal be!"

BRO OMER

Çargavî Kaçti!

Li gundekî du pîrek hene û pîr dixwazin bi tirkî biaxivin. Ji wan pîrekek kulavê xwe li ser dîwêr radixe. Ma mirîşka cîrana wê nayê li ser kulavê wê zelqê nake!

Xwediyê kulêv diavêje; "lê lê qomşî sîzin o belek tavukunuz varya, bizim kulavımızın üstüne zıç etti, ona bir taş attım çargavî kaçtı"

BERHEVKAR: MECİT ERTAŞ

Geliyê Sora ku bi ser Nisêbînê ve ye, gundekî herî mezin ê Êzidiyan e. Keyayê gund Bexo, rojekê diçe Nisêbînê; ji xwe re radyoyekê dikire û dibe gund. Li ser banê xanî antena wê girê dide. Xeta xakê û piya berec pê ve girê dide. Her cure pêdiviyên radyoyên amade û saz dike. Dotira rojê, ango sibeha inê bangî mirovên gund dike ku hunerên radyoyê şanî wan bide. Ji wan re dibêje: "Werin li ecêban binêrin, li radyoyê guhdariyê

bikin." Mirovên gund pîr û ciwan, jin û zarok gişt li odeya keya dicivin. Keya saet li 7'an beyanên radyoyê vedike, fîne ser pêla dirêj, 1580 hrz. ango Radyoya Enqereyê. Ev radyo her roja inê saet li 7'an beyanên Qurana pîroz dixwîne. Dema mele di radyoyê de dest bi xwendina Quranê dike, dibêje: Euzubillahî mîne şaytanê recîm (Pêşî ez şeytên şermezar dikim.)" Dema gundî ve hevokê dibihîzin, gelekî hêrs dibin û

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (172)

XAÇEPIRSA

Mirovên/berxan	Ş	Pa	Şerabê/Şer	B	Nûr/berxan	R	Çêra/berxan	D	Tîpa/berxan
Ç	E	L	A	K	T	E	K	Ü	Z
R	E	Ş	G	E	X	O	V		
N	O	B	E	B	A	R	N		
K	E	E	R	U	O	T	I		
L	O	A	R	D	Z	E	V		
M	E	L	E	V	A	N			
M	A	L	A	B	A	D	E		
R	O	E	T	A	R				
K	A	E	A	F					

Rejisor ..Ustaoglu derhênerê wêne	3	Wezîr ... û şepik	Tîpeke kurdî Amûreke birinê	Kanîn. şîyan	Qerf Jiyana xwe bir serî	Tîpa berî mîyê
	2		Baqil, gihîştî Lêkerekî pîrsê	Daçekeke		
Îzahkirin						Hz. ... Pêxember ek
Sincî		5		Dewleteke cîran Dijwateya hat		
Tîpa li dū e'yê		Qertafa neyênî		Dengdarê n çin	Nedereng	
Bî kirdkî wan		Gihaneke		Emr	Tîpeke kurdî	
		Organeke mirov Gelekî cîran			Navekî mêran berepaşkî	Sembola helyûmê
Bî erebî ez			Gûler wênêkêşe ke tirk		Sembola iyotê Ben berepaşkî	
Cinavkek		Herêmeke kurdan Lêkerekî pîrsê				
		Çiyayekî Kurdistan ê			4	
Mirnişînek e kurdan					Tîpa dū q'yê	

Bersiva Xaçepirsa 170'yî

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi rîya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 172'an Pirtûka Înstîtuya Kurdî 'Çend Xezel û Helbest' e.
Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.

Siyahpûs

Çend Xezel û Helbest

Wespanî Enteloyaya Kurdî ya Mêrdînê

Kesên xelata hejmarê 170'yî Pirtûka '1880 Şeyh Ubeydullah...' Qezenc kirine ev in: Atik Kaya/Semsûr, Receb Mînas/ Meleti, Şeref Bîndal /Semsûr, Zilan Nûjîn/ Gebze

PEYVA VEŞARÎ 1 2 3 4 5

MEM KAYA

BÊJING



MRALÎ RA XEBER ESTA

Manifestoyê jûwîna demokratîk

Goreyê vatena abûkat Şakarî, Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalano dawaya ke 31'ê menga gulana 1999 de Girawê Îmralî de viraziyo qandê aşî û çareserkerdina demokratîk firsendo gird vî-neno û oyo wazeno ke wa her kes na dawaye zey firsend bihesibno.

menga gulana 1999 de qandê Öcalaniya pêdiyin viraştin şî Mudanya ya Bursa û wija ra ravêrê Girawê Îmralî. Feqet dewlet abûkatanê Öcalanî ra İrfan Dündar, zey çend finanê verînan, na fin jî meseleya eskerî kerd bahane û nêvirada o jî Mahmut Şakar û Ercan Kanarî piya Öcalaniya pêdiyin virazo. Abûkat Mahmut Şakar û Ercan Kanar mec-bûr mendî İrfan Dündar Mudanya de terna û Kosterê Îmralî-9 ravêrdî Îmralî û Öcalaniya pêdiyin viraşt.

Rojname û radyo diyê Öcalanî


Abûkat Mahmut Şakarî pêdiyin peyra da zanayin ke Öcalanî imkannê tengan miyan de parastinê xo kerdo hedire. Parastanê Öcalanî 47 rîpel o. Abûkat Şakarî vat ke Öcalanî parastinê xo zey manifestoyê jûwîna demokratîk nişan hedre kenê û o parastina xo de giranî dano aşî û çareserkerdina demokratîk, jûwîn û pêdustîna şarê kurd û tirk sero. Goreyê vatena abûkat Şakarî, Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalano dawaya ke 31'ê menga gu-

lana 1999 de Girawê Îmralî de viraziyo qandê aşî û çareserkerdina demokratîk firsendo gird vî-neno û oyo wazeno ke wa her kes na dawaye zey firsend bihesibno.

Abûkat Mahmut Şakarî qiseyê xo wina dewam kerd: "Şertê terçîtkerdino zey verî dewam kenê. Öcalano hewna tîk û tenya hucre de maneno. Feqet dewlet radyoya ke bandê FM tenya ancena û na radyoya piya Rojnameyê Sabah û rojnameyê ke Bursa de vejîyênê dayê Öcalanî. Abûkatê Öcalan şakarî wast ke dewlet şertanê tecrîtkerdin rojê ravey hewado, rojname, televîzyon, kitêb û belgeyê qandê xoparastina Öcalanî hewce (lazim) bidîyê ey.

Zey ke yeno zanayin wexto ke Öcalan newe remniyabi Tirkiye, dewleta tirk o çax wastena Mehkemaya Haqê Mardimanê Ewrûpa ser. Tirkiye mehkema rê jû mektûp rîşt bî. Dewlet a mektûp de vatibi ke radyo diyaya Öcalanî. Ma eynî hefte de na zûra dewlet vet werte. Feqet dewlet no hefte dayina radyoya zûrê xo qebûl kerdî.

Merve û demokratê ma



LERZAN JANDNÎL

Bê guman her kes angorê îdeolojiyê xo nivisneno, angorê dê cuyîno û angorê problemanê dinya de niyadano û angorê dê seba halkerdena nê robleman fikirîno. Na diyena îdeolojiyê xo miyan de ew kompleks a. Yanê prensîb û narmonê daye de, metod û stratejiyanê daye de ew harmonî esto, yew yewbînîguretene esta.

La belê ma çep û demokratê xo de naye nêvînenîme. Hêni biyo ke êndî Sadamî pareznayene, hetê Mîloseviçî kerdene, Mollayanê İrani ebi "anti-împeryalistiyê" pesênayene, wayîrê çîta Merve veciyene biya nivîsê çarê nê demokratîk û çepan. Naye jî seba ma nezena, sebetake ma raya xo rind bîvînenîme, rojnameya ma de Ö. Politika de kenê.

Rey tede niyadîme se vanê: "... Ez hêviye kena, ke wa no hereketê Merve Xanîme seba parçayanê cematîyê bindestan bibo ornag... EZ bi xo ebi zere û can bawariya laiklike kena, la belê ê kemalîstan laiklike niya, dîktatorî ya." "Ez bi xo astiste de 32 sere ya û na derheq de lewê to de ra Merve. Eke azadiya rakerden û guretena insanan çîna, êno a mana, ke qe azadiyê de dinan çîna." "Esas çiyê ke ez wazena binivîsî; tawoke mi miyanê teqûreqî de ronîştene de niyadêne, mi viramayena birêz Leyla Zana û xaftîla xo lewê Merve Kavakçî de diyena mi biye.... Herhalde des rojî ra tepiya sarê xo kena ra û sond wena...." Nê, nê hunde kî nêbeno, zê şîma jî nêbeno.

Ganî verê nivîsnayena xo şîma rind bifikirê. Şîma çik nivîsnenê? Qeyî nivîsnene? Ebi nivîsê xo wazenê senê mesajan birêrê şarê ma? Nika bêrîme meselya xo: Merve Xanîme kam a? Yan jî ters ra bipersîme, yanê Merve kam niya?

Merve bi xo, yanê teyna ebi Mervetiya xo kam bena wa bibo, na meseleya ma niya. Beno, ke yew dewije bo, yew akademikere bo, yew şagirte bo, yew hemwelatiya Amerika bo. Wa seba îdeolojiyê xo, seba bindestan şer mekero, meveciyo kowan, hepsan mekuyo. Wa dayînanê şemiyê nas mekero. Wa dewêke amê vêşnayene mezano. Wa Leyla Zana û hevalê daye meşinasno, mezeno ê kofî rê û qeyî ûca rê, wa ere dîne wayîr meveciyo, wa sebetake û şarê dîne bawariya xo biyaro re zon, lec mekero, vengê xo mekero, xo ker û kor kero. Nê seba ma ra krîterî niyê.

La belê Merve ebi îdeolojiyê xo kam niya? Merve demokrat niya. Seba heqanê xo hetkariya demokratîk wazene. La belê a bi xo ke amê îktîdar, heqê bîni çîne, teyna heqêke a dana, estê. Tenê zê kemalîzmî ya. İnan de TUDEH ganî derse de rinde bo. Ganî ma belediyeyêke destê nê îdeolojiyê de bî, yan jî huna detê nê de rê de, -Karkeranê Belediyeya Kağıthane"yî xo vîra mekerîme-niyadîme.

Merve ebi îdeolojiyê xo anti-împeryalist û anti-siyonist niya. Eke muhalefet de bê, heya. Hama eke amê îktîdar hem siyonîzmî de hem jî împeryalizm de hemverê kurdan, çepan û çîyabawerkeden 'dansê gulu-guluyî' kenê.

Merve ebi îdeolojiyê xo temîz jî niya. Meseleya Susurluke de, pereyê Bosnaye de û ê karanê bînan de temîz niyo. Merve ebi îdeolojiyê xo çîqa "musluman a" hunde jî "tirk" a. No jî hem qederê şarê kurdî yo, û hem jî tengasiyî û dirûtiya insananê nê îdeolojiyê ya. Na derheq de "Mayê Êneyî-Cuma Annelerî" nimûneyêde zaf qij o.

Ma ma rê çî mend, ke ma meseleyanê xo yê muhîman ca verdîme, ere merve û çîta daye dime kumê?

Eke naca mantiq "dişmenê dişmenê mi dostê min o" çî feyde ke na jî seba şarê kurdî derbas nêbena. Çimke dişmenê dişmenê ma ma se bikerê kî, ne şîkinê ne jî wazenê, ke dostê şarê ma bê.

Hêviya mi, wa demokrat û çepê ma tayîna biifîkrê, miyanê Saddam û Clintonî de memanê. Tayîna hîra, tayîna azad û her çî ra ver jî seba şarê ma bifikirê.

MEMED DREWS
(e.mail:mehmet@welat.com)

Dewleta her fin tevayê kena behane û nêviradene ke Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan abûkatanê xoya re-pêdiyin virazo. Abûkatê Serokê Giştî yê PKK Öcalanî 6'ê menga gulana 1999 şî Mudanya ya Bursa ya wija şîrê Girawê Îmralî û Öcalaniya pêdiyin virazê. Feqet d ewlet muhalefeta haway bahane kerd û virada ke abûkatî Öcalaniya pêdiyin virazê.

Abûkatanê Öcalanî nêviradayin şîhlalkerdinê haqê parastin he-ma û wina vat: "Qeçekê (do-manê) vîzêrîni jî zanê ke eke dewlet biwazo, torg jî bivaro, şena ma abûkatan bero Girawê Îmralî. Fe-qet dewlet nêwast ma o roj Öcalaniya pêdiyin virazim."


Goreyê vatena abûkatanê Öcalanî dewleta vernî ra wina kena. Wexto ke wazena iyê şenê Öcalanî pêdiyin virazê, feqet wexto ke wazena nêwazena tevayê kena bahane wazeniya pêdiyin viraştin gena (ra-mana).

Ewro meşt Girawê Îmralî hîrê şîngê Öcalanî yê benê pir. Öcalaniya Girawê Îmralî de rojê dawaya çareser paweno. No maben de parastina xo imkannê tengan miyan de kerdo hedire.

Abûkatanê Serokê PKK Abdullah Öcalanî ra Mahmut Şakar, Ercan Kanar û İrfan Dündar 10'ê

Serokê Belediyeya Wanê Şehabettin Özarlaner

“Em jî dixwazîn vî welatî bi rê ve bibin”



Serokê birêz, di serî de em dixwazîn hûn encamên hilbijartinan binirxînin.

→ Di hilbijartinên 99'an de, li bajarê Wanê hilbijartin, ji bilî çend bûyerên mûnferîd ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kirin, di bin mercên asayî de derbas bû. Bêgûman di vî warî de gelê me jî peywira xwe baş bi cih anî û baldariya xwe bi awayekî zelal nîşan da.

Li Wanê bi radeya % 70'yî HA-DEP'ê deng girtiye, lewre jî pêwîst e ku ev partî ji hêla her derdor û ramanî ve bê pejirandin. Di hilbijartinê derbasbûyî de, di warê deverî (herêmî) de em serketî derketin. Di warê giştî de sedema bisernetina me, ne bi tenê em bûn. Li ser sindoqan hilbijêrên me hatin çewsandin. Li Tirkiyeyê 250 hezar sindoq hene. Di her sindoqê de bi kêmasî 5 dengên me heger hatibin dizîn, ev jî dike milyonek û 250 hezar deng ku ev beramberî %'î 5'ê hemû deng e. Di rastiya xwe de partîya me, bendava jî %'î 10 bi rehetî derbas kiriye.

Di nav gel de qenaetek heye; dibêjin hêzên dewletê nahêlin ku belediyeyên ku HADEP'ê bidestxistine, bixebitin....

→ Heta niha me tişteke bi vî rengî his nekiriye. Lê em dizanin ku çav li ser me

ne. Di serî de dihate gotin ku em dê beşdarî merasimên 23'ê Avrêlê nebin. Lê me ev tirs serobino kir. Em beşdarî wê merasimê bûn. Ji berê ve em dibêjin ku zagon anti-demokratîk in. Em bi tenê vî yekê nabêjin. Tevahiya serokên partiyên heyî di mîfîngên hilbijartinan de qîr dikir û digot ku li Tirkiyeyê qanûn û zagon ji demokratîkbûnê dûr in. Lê li gorî xagonên heyî jî em mecbûr in ku karên xwe yê belediyeyê bi cih binin. Em hurmetê ji encama hilbijartinê re digirin; pêwîst e ku ew jî hurmetkar bin, ji bo serkeftina ku HADEP'ê bi dest xistiye. Ez ne di wê baweriyê de me ku dewlet ji bo xebatên me bibe asteng. Em jî dixwazîn vî welatî bi rê ve bibin. Bi dîtina min, di warê aborî de jî astengî dernakevin pêşîya me. Dandandînan me bi rayedarên dewletê re hene û tîkiliyên tekûz di warê aboriya belediyeyê de hatine saz kirin.

Gelo ji bo tabloya siyasî, hûn dikarin analîzeke çawa bikin?

→ Tabloya siyasî ya îro, ji ya berê baştir e. Kiryarên partiyên ku ji xwe re digot “em sosyaldemokrat in” derketin holê. Hema hema bêje tevahiya van partîyan di hikûmetan de cih girt. Di programên tevan de, bi taybetî di programa CHP'ê de, ji bo çareserîya Kêşeya Kurd

Özarlaner, di sala 1953'an de li Ebexê (Özalp) ji dayik bûye. Özarlaner, 13 salan di warê tenduristiyê de dixebite. Di vî navberê de li Zanîngeha Çukurovayê Fakulteya Kargerî û Aboriyê bi serî dîke.

Di wextê xebatê de di saziyên demokratîk ên memûran de bi awayekî çalak xebitiye, bi gelek surgûn û cezayan rû bi rû maye. Wî, di sala 1985'an de îstîfa kir. Peyre dest bi şewirmendiya aborî kir û bi karê aboriyê re mijûl bû.

Şehabettin Özarlaner di sala 1990'an de sazûmankarî û sekreteriya bajêr ya HEP'ê kir. Di navbera 1991-93'an de serokatiya bajêr ya HEP'ê û piştî girtina HEP'ê serokatiya DEP'ê kir. Ew, di heman demê de sazûmankarê HADEP'ê ye jî. Wî, karê Sekreteriya Giştî û Cîgiriya Serokatiya Giştî ya HADEP'ê pêk aniye. Özarlaner, di 1995'an de ji Wanê wekî mebûs hate hilbijartin, lê ji ber ku HADEP jî bendê derbas nebû, ew jî neket parlamentoyê. Şehabettin Özarlaner, zewiciye û bavê sê zarokan e. Niha jî Endamê Meclîsa HADEPê ye.

gelek xalên berbiçav hebûn. Lê hate dîtin ku dema ev partî hatin ser kar, bûne “ker û lal!” Li gorî dîtina min, tabloya îro ji tabloya berê ne xirabtir e.

Niha tê gotin ku we belediyeyê bêdeyn wergirtiye. Gelo rast e ku deynê belediyeya we tune ye? Li hêla din problemên sereke yê bajêr çi ne?

→ Rast e! Deynê belediyeya me tune ye. Kêma û zêde li dora 800 milyonî jî peyrewê belediyeya me heye. Serokê kevin yê belediyeyê Aydın Talay diyar kiribû ku wan parkeke gelek mezin a makîneyan dewrî me kiriye. Ev yek ne rast e. Ez li ser kêmasiyên kesan polîtîka û kar nakim. Heger Aydın Talay tiştên baş kiribûn, li ser serê xwe ezê wan bişopînim, na! heger kêmasî jî hebûn ezê wan kêmasiyan jî holê rakim. Lê rastî ev e: Li gorî brîfînga ku ku doh min ji hevalên xwe stand, parka makîneyan ku Aydın Talay gotiye “gelek mezin e” tune ye. Niha 26 otobûsên me hene, lê mixabin 10 ji wan her gav bi qisûr û xirabe ne. 30 taxên me hene îro em nikarin ji bo her taxê otobûsekê bixin seferê. Niha em seferber bûne ku gelê me di warê çûn û hatinê de tengesiyê nekişîne. Pirsgirêka me ya din jî, pirsgirêka paqijiyê ye. Bi rojan em li nava Wanê geriyên. Me dît ku li Wanê “Çiyayên Sergoyan” çêbûne. Di pêşerojê de em dê li bajarê xwe bi navê “Em Wana xwe paqij bikin, Wana xwe paqij bihêlin” kampanyayake paqijiyê bidin destpêkirin. Ez û personelê belediyeyê jî di nav de, ji xwendekaran bigire, heta muxtaran, emê bajêr li hev parve bikin û paqij bikin.

Pirsgirêkeke me yê din jî, pirsgirêka avê ye. Li gorî tespîtan %'î 25'ê kesên jiyana xwe li Wanê didomînin, ji avê bêpar in. Li hêla din pirsgirêka me ya kanalizasyonê heye. Bi taybetî havînan ji ber germê “kollî-basîlî” zêde dibe. Mirov nikare bikeve Gola Wanê. Ji bo ku em Gola Wanê paqij bikin, pêwîst e ku em

tesisekê ji bo paqijkirina golê çêkin. Ev pirsgirêk ne bi tenê pirsgirêka Wanê ye, her wiha pirsgirêka dewletê ye jî. Em difikirin ku bi piştgiriya belediyeyên dorhêla golê, Gola Wanê hêjayî navê wê bikin.

Pirsgirêkeke din jî ev e ku, kesên ku heta niha hatine ser karê belediyeyê, xizmet ji bo derdorên ku deng nedane wan, nebiriye. Emê xizmetê ji her derdorê re bibin.

Rewşa kadroyên we yê teknîk çawa ye? Belediyeya we wê bikaribe xwe finansanse bike?

→ Ji aliyê teknîkî ve kadroyên me kêma in. Niha em hewl didin ku kadroyên xwe yê heyî binasin û kêmasiyên wan tespît bikin. Em di wê baweriyê de ne ku hebûn û çavkaniyên belediyeyê baş bibe bikaranîn, emê di warê finansmanê de jî tengezar nebin.

Gelo we dil heye ku di pêşerojê de bi belediyeyên ku HADEP'ê bi dest xistiye re yekitiyê saz bikin?

→ Belê fikreke me yê bi vî rengî heye. Me niyet heye ku ne tenê yekitiyêke ku bi tenê ji belediyeyên HADEP'ê bi dest xistiye, her wiha bi belediyeyên ku partiyên din bidestxistiye re yekitiyê pêk binin. Em difikirin ku “Yekitiya Belediyeyên Derdora Gola Wanê” ku berê jî hebû xurtir bikin.

Gelo di warê çandî û hunerî de projeyên we bi çî rengî hene?

→ Em dê gelek qedr û qîmetê bidin çalakiyên çandî û hunerî. Di salên derbasbûyî de ez bi xwe “Serokê Komeleya Folklorê ya Belediyeyê” bûm. Çend sal berê ev sazî hebû lê niha heye tune ye ez baş pê nizanîm. Me dil heye di bin banê belediyeyê de beşên pirtûkxane, tiyatroyê, kovar, rojname û hwd. ava bikin.